

Awir'ek berbi cihana kevnar va.

ZERDEŠT P'ÊXEMBER: GELO EM HER TIŠTÎ DI DERBARÊ WÎ DA DIZANIN?*

*“Wisa t'evlêhev e,
wisa di nav nehênîyan da veşartî ye,
wek dîroka medên kevnar”.*
(Gotina kevnar a r'ûsan)

I P'êxemberê Xwedê! (Li şûna pêşgotinê)

Zerdešt! ...
Gelo k'î vî navî nizane?
Gelo k'ê, hîç nebe, hema carekê di
derbarê wî da nebihîstibe?
Navê sêwirdarê yek ji olên cihanê
yên kevtirîn di nav gelên cuda da bi
şewazên cuda tê bilêvkin: Zaratûstra,
Zaratûstra, Zoroastr, Zerdešt, Zerdûšt,
Zradašt. Lê k'urd ji mêjva wî wek Zerdešt
p'êxember dizanin. Û ev nava li ser zarê
p'ir'anîya k'urdan e –ji biç'ûkan heya
mezinan!

Lê gelek k'urdan navê Zerdešt
dîyarî lawê xwe yê t'ezebûyî kirine (û
îrojî dîyarî didin) – wek t'acekî pîroz!
Di cihana zanistê da, li ser bingeha
wan agahîyan, ên ku di Gatan da hene (Gat – drozge û pesnbêjîyên ji bo Ahûra Mazda),
hatye zanîn, ku Zerdešt – kesayetîyeke dîrokî ye, lê bi demê r'a (di “Avêsta biç'ûk” da)
wek kesekî efsanewî, nivxwedayî tê nasin...

Hê di k'ûrahîya dîroka kevnar da ew wek P'êxemberê Xwedê naskirine...

Di dewra IV a berî serdema me da nivîsk'ar û dîroknûsên kevnar ên yewnanî Zerdešt
wek kesayetîyeke efsanewî, filosof û stêrkbêj (astrolog) hejmartine... Gelek filosof-
ezdazanan ew wek r'êformatorekî mezin, filosofekî mîstîk naskirine, yê ku t'aybetîyeke
abstrakt, a felsefî daye ola îranî ya kevnar, û gelek bîrewar-filosofên mezin ên serdemên
peyr'a ji ber wê tima û zendegirtî mane.

Kesayetîya wî di nav xêlîya efsane û ç'îrokên kevnar da pêç'ayîye...

Yewnanîyên kevnar ew sembola bîrewarî û xêredmendîya R'ojilatê hejmartine, ew
Zoroastr, ango, Lawê Stêrkê navkirine. Û ev jî bê bingeh nînbûye, heya r'adeyekê ew di
dîtina xwe da r'ast bûne, lewra ku mafê sêwirdarê “ola fezayî” (kosmîkî) hebûye, ku wisa
bê navkirin, hem jî, anegorî mitolojîya zerdeştîyê, r'ewanê (r'uh) Zerdešt ji asîmanan hatye
ser erdan. “Lawê stêrkê” bûye hewarî û p'eyamdarê yekem ê ola nûdiyarbûyî (wehî) a
cihanê, ya ku paşê bi navê sêwirdarê xwe, wek *zerdeštî* hatye navkirin... Hema wê demê jî
bi bawer bûne, ku “Lawê Stêrkê”, wek p'eyamdarê ola pîroz, hema di Serdema
Warguhêzîyê da hatye şandin, ji bo ku di cihanê da mirovayê ji xewa hingorê hişyar bike.

Di cihana r'ewanî (r'uhî) da tê gotin, ku jidayîkbûna wî bûye nişana destpêka
Serdema ji hev cudakirina qencîyê û nep'akîyê di gerdûn û fezayê da, ... û erk'a Zerdešt
ew bûye, ku bawerîya Yek Xwedêyî di sewda û r'ewanê mirov da bi cî bike – Xweda, yê



ku sêwardarê cihana matêrialî û r'ewanî ye, ku wisa jî divê mirov amade bin, eger pêwîst be, li dijî nep'akiyê bitêk'oşin – ew çi şeweyî dibe, bila bibe.

Zerdeştî yekem ola kevnar a r'astîyê ye, û di wê da Qencî û Nepakî ji hev hatine cudakirin, wek du destpêk, ên ku di cihana xwezayê da jimêjva hene, û di navbera wan da tiştê ku wana bigihîne hev, nîne... P'êxember bang dike, ku li dû qencîyê her'in û nep'akiyê r'ed bikin.



Anegorî bawerîya zerdeştîyê, mirov divê li dû şopa Ahûra Mazda bimeşe, lêbelê ew serbest e, çi r'eyê hîlbijêre, ew xwe k'ole an xulamê Xwedê hîs nake... Cara yekem Zerdeşt ji bo mêr û jinê mafên weke hev naskirye. Ewî cara yekem r'êya r'izgarîya mirovên hejar û bê cih û sit'ar destnîşan kirye, û di heşê bawermendan da ew r'aman daye bicikirin, ku xizmeta Xwedê ya r'astîn ne di p'ir'anî, yan dewlemendîya gorîdanê (qurbandayîne) da ye, lê di R'amana Qenc, Gotinên Qenc û K'arên Qenc da ye, û eva jî bêhtir li Xwedê xweş tên, ne ku ew hemû dîyarî, yên ku bi k'eda xwe nehatine qazenckirin.

Ji bo Zerdeşt p'êxember k'ed pîroz bûye, wek xizmeta Xwedê ya li r'û erdan. Anegorî bawerîya wî, cotk'arî, r'ênçberî, şênîkirin û her k'erek, ê ji bo xurtkirina k'ara (kêra) cihana matêrialî pêk tê, erk'a mirov a pîroz e di cihanê da.

Bireawerîya Zerdeşt bandoreke mezin li ser xaçp'arêziyê, îslamê, û bûddîzmê, li ser gnostît'sîzmê û daosîzma çînî hiştye. Ewê bandoreke mezin li ser r'amana felsefî ya R'ojhilatê û R'ojavayê hiştye. Hêgêl (1770 – 1831) di zerdeştîyê da bi t'aybet t'êk'oşîna di navber du dijberîyan – Qencîyê û Nepakîyê da cuda kirye. T'êodor Fixnêrê hîmdarê t'êorîyên psîkofîzîolojîyê û psîkofîzîkîyê (1801 – 1887) bi r'aman û nîgarên lawijên (beyt) Zerdeşt hestyar bûye...

...Cara yeke ewropî di sala 1771ê da bi “Avêstayê” r'a nas bûne, dema ew bi zimanê fransî hatye weşandin (wergêr – a Ankêtil dyû Pêrron), lê di sala 1776an da di bajarê R'igayê da wergera wê ya bi zimanê almanî dertê. Û piştî vê di cihana zanîstê da di derbarê vê p'irtûka pîroz û navê sêwardarê wê da goftûgoyên zanîstî destpê dibin... Û paşê ev



govtûgo û gengeşîyana dibin sedem, ku di derbarê zerdeştîyê da wêjeyeke p'ir' dewlemend bê sêwirandin.

Wergera “Avêstayê” ya bi zimanê r'ûsî di sala 1861ê da ji hêla r'ojhilatzan- sanskrîtzanê bi nav û deng K. A. Kossovîç va pêk tê. Paşê helbestvan Konstantîn Balmont di sala 1899an da bi şewazê helbestî beyt'ek a “Avêstayê” (“Beytek ji Zend-Avêstayê”) dinivîse, paşê, di heman salê da helbesta “Bî motîvên Zend-Avêstê”, lê di sala 1903an da – “Kovana Ahûra Mazda”.

Paşê, di demên cuda da, di R'ûsîyayê da wergerên beşên cuda yên “Avêstayê” hatine

weşandin. Ew wergerên Yê. A. Bêrtêls, Î. S. Bragînskî, S. P. Vînogorodovayê, K. G. Zalêman, Î. M. Oratorskî, Î. A. Stêblîn-Kamênskî û yên dinê bûne. Her weha di derbarê “Avêstayê” da lêgerînen zanistî pêk hatine. Di demên cuda da du p'irtûkên S. N. Sokolov ên “Zimanê avêstî” (1961) û “Zimanê Avêstayê” hatine weşandin. Di sala 1997an da berevoka “Avêsta di wergerên r'ûsî da”(1861 – 1996) r'onahî dîtye.

Îro di nava wan p'irtûkan da, yên ku li ser vê mijarê hatine weşandin û ji hêla xwendevan va bêhtir tên xwendin, du p'irtûkên akadêmîk Î. A. Stêblîn-Kamênskî ne: “Avêsta. Beyt'ên bijarte. Ji Vidêvdatê” (s. 1993) û “Gatên Zardeşt. Wergera ji zimanê avêstî, gotarên pêşekî, şirove û pêvek” (s. 2009).

“Avêsta” wek dur'a berhemên r'amana r'ewanî û wêjeyî-hunerî ya kevnar tê hejmartin. Bîrewarên cuda, ahengsaz (composer), wênesaz û nivîsk'aran ji bo berhemên xwe nîgara Zerdeşt kirine bingeh, wek diyardeya (fênomêna) r'ewanî (r'uhî)...

Di opêra Mot'sart a “Şivêvîya batînî” (“Die Zauberflöte” – 1791) da nîgara Zerdeşt diyardeya r'onahîyê û bîrewarîyê ye.

Dengveger'a lêgênda di derbarê wî da wisa jî di “Faust”a Goêtê da (1808) dide der. Lê di afraandineke xwe ya here navdar, di helbesta xwe ya “Weysêta bawerîya kevnar a farizan” da Goêtê têgihîştina xwe zerdeştîyê tîne zimên, wek bîrûbawerîya serk'evtina r'onahîyê li hember tarîyê.

Paşê, hê dereng, nivîsk'ar û filosof Frîdrîx Nîtsşê afrandina xwe ya “Zerdeşt weha axivî...”, û ew li ser bingeha têgihîştina bîrûbawerîya Zerdeşt îdêaya “xurtemerd” pêşdixe (1883 – 1885)... Û piştî deh salan, di sala 1896an da, di bin bandorîya vê berhema Nîtsşê da, Ştraûs bi heman navî poêmeke sîmfonîk dinivîse...

Lê derdorê çarsed salî berî vê, di sala 1510an da, wênesaz, grafîk û mîmarê mezin ê îtalî R'afaël Santî bi spartina papa Yûliûsê II diwarên serayên qesra Vatîkanê bi wêneyên xwe dinitirîne. Di her p'arç'eyekî wêneyên ser diwaran da bi awayekî cudabêjî (alêgorîk)

warekî jîyana mirovan hatye nitirandin: *felsefe, ezdazanî, dadwerî û poêzîya...* Li ser wî p'arç'eyî, yê ku *felsefeyê* diyar dike ("Dîbistana At'înan"), wêneyê Zerdeşt hatye nitirandin – goga asîmanî li ser destê wî (li wêne **binihêr'in!**).

Û ev wêneyê ser dîwêr (fresco), bi r'astî ne t'enê wek yek ji berhemên here baş ên R'afaël hatye p'ejirandin, lê wisa jî, yê serdema vejînê (Renaissance).

... "Avêsta", wek P'irtûka Pîroz a zerdeûtîyê, berhemeke nebînayî ya r'amana mirovî ye. Û dibe lewra jî mirov dijwar bikaribe di dîroka mirovahîyê da bîrûbawerîyeke dinê, ya weke zerdeştîyê, bibîne, ya ku wisa dabin ber devê şûr û êgir, wisa tengav kiribin (hema, heya r'adeya t'unekirinê!), lêbelê ewê ne ku t'enê bikaribûya bê p'arastin, lê wisa jî awir'ên mirovên cuda berbi xwe bik'şîne û mitaleya virovên gewre yên serdemên cuda bi xwe gîrokiribe...

[2, cnp. 25 – 42; 4, r'û. 4 – 30; 3, berg 1, r'û. 55// berg 9, r'û. 593//berg 16, r'û. 212; 27, berg 12^A, r'û. 545 – 547//berg 19, r'û. 238 – 239//berg 22^A, r'û. 881 – 884; 7, beşê I, 8, r'û.50 – 61; 16, r'û. 279 – 283; 17, r'û. 380; 19, r'û. 6 – 63; 25, r'û 5 – 29 û Wik.]

Hizir û r'amanên Zerdeût P'êxember hebûna t'evahîya mirovahîyê ne, lê ew bi xwe, wek ku hemû mirovên gewre yên dîroka şaristanîya mirovahîyê, dewlemendiya t'evahîya mirovahîyê ye, lewra jî di hemû dem û dewranan da bala nûnerên gel û bawerîyên cuda li ser wî bûye.

Ev – ji bo nasîn û têgihîştina giştî!

Helbet, dîrokzan, filosof, ezdazan, hunerzan, wêjezanê hê gotina xwe di derbarê Zerdeştê Gewre û ola diyarbûnê ya cihanê ya yekem – zerdeştîyê da bibêjin!

Lê ezê ji vir û pêva li ser hinek pîrasên têk'lîdarî jînenîgara P'êxemberê Gewre r'awestim, û hewl bidim, di nava goveka agahîyên dîrokî yên heyî da, ji bo hinekên ji wan bersîvan bibînim.


II

Li dû şopa dîroka "windabûyî" ...

1. Nêr'în, pêşbînî, yan tiştên dîrî heş û sewdayên mirov?

Kommenterad [A1]:

ДЕРЖАВА АХЕМЕНИДОВ



Tê zanîn, ku jînenîgarîya her mirovekî da (ew k'î dibe, bila bibe!), hiç nebe, cîyê bûyîna wî tê nivîsîn, ez êdî di derbarê destnîşkirina net'ewa wî da nabêjim... Lê di jînenîgarîya Zerdeşt P'êxember da, yê ku bi saya bîrûbawerî û drozgedarîya xwe, wek p'êxember, hêjayî r'êzgitîna mirovahîyê bûye, gelek tişt hene, ku li hev nagirin û di nava wan da nak'okîyaan hene...

Bi dîtina zanîyaran, di P'irtûka Pîroz – “Avêstayê” da jî hiç jêderk di derbarê bûyereke dîrokî ya diyar da nîne, ya ku mirov bikaribûya anegorî demnûsiya dîroka cîhanê (k'ronologî) be... Lêbelê, bi vêt'a, wisa jî destnîşan dikin, ku di “Avêstayê” da hinek bûyer hene, yên ku dikaribûn bibûna destnîşana demê, minak, t'or'a gênêologî... Lêbelê, dibêjin, ku r'astîya wan jî bi guman e.

Çend şaxên jînenîgarîya P'êxember hene.

Yek ji wana dibêje, ku ew li ser xaka Baktrîya dîrokî (li xerîteya I. Binhêr'in – satrapîya XII), li derdorên bajarê Balxê (Afghanistana îro) jî dêya xwe bûye. Anegorî yeke dine, ew di R'adêsê da (p'er'ê bajarê Tehrana îroyîn ê bi navê R'ay), an jî li r'ojhilatê Îrana Mezin, hatye cîhanê, di navbera sedsala VI û nîveka yekem a sedsala V a berî serdemê me...

Zanyar-ênt'sîklopedîst û mitaledarê fars ê sedsala navîn el Bîrûnî (973 - 1048), anegorî agahîyên demnûsiya (k'ronologî) kevneşopî ya p'ehlewîyan tê ser wê nêr'inê, ku Zerdeşt P'êxember 258 slalî berî êrişa Îskenderê Makêdonî a li ser Îranê jîyayye...

Wisa jî dibêjin, ku di Gatan da di derbarê welatê Zerdeşt û Kavî Viştaspa da agahî nînin, ji ber ku yên ku Gat gûhdar kirine, baş dizanibûne, k'a ew çî welat e... Dibêjin, ku bîrûbawerîya Zerdeşt ji nivşekê derbazî nivşeke dinê bû, ji hêla t'erfedarên wî va hatye pêşxistin û di govekeke berfirehtir da belav bûye, lêbelê kevneşopîyên dîrokê di gelek cîyan da hatine windakirin, demnûsî, wek ku ew îro heye, wê demê hê nînbûye.

Di encamê da di pîrsa cî û dema belavkirina bîrûbawerîya P'êxember û herêma destpêkî ya belavbûna zerdeştîyê da nêr'inên cuda drk'etine hole.

Eger hinek dibêjin, ku bi misogerî dîyar nine, k'a Zerdeşt k'engê jîyaye û erk'a xwe ya dirozdarîyê pêk anîye, lêbelê hinekên dinê jî dibêjin, ku ewî bîrûbawerîya xwe di hinek herêmên r'ojhilatê Îranê, di Asîya Navîn û Afxanistanê da belav kirye.

Li ser bîngeha lêger'inên nivîsên pîroz ên zerdeştîyê zanîyar gihîştine wê bawerîyê, ku Zerdeşt ji malbeta spîtamam (erk'darên olî) derk'etîye. Ku ew di hevtsalîya xwe da dest bi p'erwerdeya erk'a pîroz kirye, ... û mamostayê wî yê yekem bavê wî bûye, ku ewî êdî di 15 salîya xwe da dest bi erk'a xwe ya oldarîyê kirye, lê di t'emenê xwe yê 30 salîyê da êdî wek mirovekî zana hatye naskirin...

Wisa jî tê gotin, ku Zerdeşt di Îranê yan di Asîya navîn da dest bi danasîn û belavkirina bîrûbawerîya xwe kirye, lê ji hêla civaka xwe va nehatye p'ejirandin...

Hinek dinivîsin, xwedêgiravî, p'adişahê Baktrîyê (? – E. C.) Goştasp (Viştaspa) li Zerdeşt xwedî derk'etîye û alîk'arî dayê, ku ew bîrûbawerîya xwe di nav gel da belavbike, lê bi dîtina hinekên dinê, xwedêgiravî, dema Zerdeût di bakûrê dewleta farsan da bê cî û st'ar ger'yaye, ewî serdarê wê herêmê (? – E. C.) yê bi navê Viştaspa anye ser bawerîya xwe.

Heya hinek dibêjin, xwedêgiravî, Zerdeş li devereke bakûr-r'ojhilatê derya Aralê, li ser erd û aqarên Qazaxistan û Tacîkstana îro jî dêya xwe bûye, ...lê hinek li ser wê nêr'inê ne, ku Zerdeşt li devereke ç'iyayên Ûralê (R'ûsîya) hatye cîhanê...

Û, weha, ev êdî derdorê du dused salî ye, goftûgo û gengeşîyên zanîyaran didomin, lê ew hê jî negihîştine nêr'inekê, k'a gelo, Zerdeşt di k'îjan welatî da jîye û herêma destpêkî ya belavbûna bîrûbawerîya wî – zerdeştîyê, li k'u bûye.

Û, piştî gengeşîyên demdirêj, di cîhana zanistî da “gihîştine wê nêr'inê”, ku agahîyên jînenîgarîya Zerdeşt P'êxember p'ir' kêman in, lê herç'ê hene jî, li hev nagirin û bawerî bi wana nînin, û hejmartine, ku pîrs “bidawî bûye”...

Lêbelê, zanîyarên serdema me dibêjin (û gotina wana jî bê bîngeh nîne!), ku, dîsa jî, di wan agahîyan da tiştên pêzanînê hene, yên ku dikarin dîtina r'astîyê r'a bibin alîk'ar: eger Zerdeşt “Avêsta” di serdema hexamenîyan da (piştî saka 550î ya berî srdema me) nivîsîbûya, wê demê dê tişteki heşmendîbûya, eger navên desthilatdarên wê binemalê di wê da hebûna.

Li ber ç'avan e, di derbarê wê pîrsê da ewqas nêr'in û dîtînenê bê bîngeh û hinartî yên ji hev cuda û dijberî hev berev bûne, û hebûna wana pîrs gîhandîye r'ewşeke wisa nedîyar, ku dijwar mirov bikaribe bir'yarbike, k'a lêger'inan ji çî destpê bik...

Bi r'astî, her tişt wisa t'evlihev e û li hev piç'ikye, qey bibêjî, hinekan bi zanebûn hildaye, her tişt wisa bi hev guhar'tine, dana wisa t'evlihevkirine, agahîyên dîrokî berovajî û t'ewş kirine, ku dijwar mirov bikaribe, wisa bi hêsane daneyên dîrokî û agahîyan ji hev bibijêre...

Lê, dîsa jî, lêger'in dikaribûn biencam bibûna, eger ji mirov r'a li hev bihata bersîvên van pîrsan bidîtana: “*Ji bo ku r'ewşeke weha ya t'evlihev û bi nak'okî derk'etîye çî sersedemên dîrokî hebûne? ... Mirov ç'avkaanî û ajoyên (motîv) p'eydabûna van nak'okîyan li k'u bişer'e?*”

Û, ji bo ku mirov bikaribe van hemû nêr'in û pêşdîtanan ji hev vebijêre, dibe ku, di destpêkê da divê bibîne, k'a îro çî li ber destê me heye, û paşê, wan hemûya bi awayekî dabeş bike...

Weha, di derbarê Zerdeşt da dinivîsin, xwedêgiravî:

– Di Gatan da ne di derbarê welatê Zerdeşt da, ne di derbarê welatê Kavî Viştaspa da agahî nînin, lewra ku ji bo wan mirovan, ên ku ew guhdar kirine, dizanibûne, k'a ew çî welat e...

– ew li ser erd û aqarên Baktrîya dîrokî, li derdorên bajarê Balxê (Afxanistana îro) hatye cîhanê;

– ew di R'adêsê da jêyaye (p'er'ê T'êhrana îroyîn yê bi nave R'ay)...;

Kommenterad [A2]:

– ew li r’ojhilatê Îrana Mezin ji dêya xwe bûye (dewrên VI – V ên berî serdema me);
 – ew di Îrana kevnar da jîyaye, ... an jî di Asîya Navîn da, ji derya Aralê berbi bakûr-r’ojhilatê va, li ser xakên Qazaxistan û Tacîkistana îroyîn...;
 – ew li deverên derdorê çiyayên Ûralê hatye cîhanê, û heya hinek navê k’ilafeyên (xerabe) kevnabajarên Sintaştâ û Arkaîmê yên di herêma Çêlyabînskê da didin (Rûsiya)...;
 Wisa jî tê gotin, xwedêgirav:
 – mirov nikare bibêje, k’a Zerdeût li k’u û k’engê hatye cîhanê û erk’a xwe ya p’êxemberîyê pêk ane;
 – Zerdeşt bîrûbawerîya xwe di hinek herêmên r’ojhilatê Îranê, di Asîya Navîn û Afxanistanê da belavkirye;
 – p’adişahê Baktrîyayê (?! – E. C.) Goştast/Vîştaspa li wî xwedî derk’etye û bi xwe jî destek daye belavkirina zerdeştîyê...;
 – dema Zerdeşt wek p’enaberekî bê cî û st’ar di herêmên bakûrê dewleta farsan da ger’yaye, ewî serdarê herêmî yê bi navê Vîştaspa, anye ser bawerîya xwe...;
 ...Li ber ç’avan e, her çiqas di van nêr’înan da nak’okî hene, dîsa jî di wan da agahîyên balk’êş veşartî ne, yên ku, her çiqas, daneyên konkrêt destnîşan nakin jî, lê nepêkanîya agahîyên heyî derdixin holê.

Ji van hemûyan mirov dikaribû ev xalên hanê cuda bikirana:

– ... Di “Avêstayê” da hinek agahî hene, yên ku dikaribûn ji hêla destnîşankirina demê va wat’eya xwe hebûna, mînak, *t’or’a gènêologî*... Lêbelê tê gotin, ku pêbawerîya wana bi guman e;

– ... Di “Avêstayê” da di derbarê hiç desthilatdarekî jî binemala hexamenîyan da agahî nînin, ên ku ji sala 550î ya berrî s.m. r’êvabirîya welêt kirine...

– ... dema ger’a xwe ya li erd û aqarên herêmên bakûrê dewleta farsan Zerdeşt serdarê herêmî (?! – E. C.) yê bi nave Vîştaspa anye ser bawerîya xwe...

– ... p’adişahê Baktrîyayê (?! – E. C.) Goştasp/Vîştaspa li Zerdeşt xwedî derk’etye û alîk’arî daye wî, ku ew zerdeştîyê di Bakryê (satrapiyeke r’ojhilatê împêraatorîyayê) da belav bike.

Li ber ç’avan e, ku di van nêr’înan, dîtin û şaxên serpêhatîyan da hiç tişteki t’omerî nine, û eger mirov pêbawerîya yekê jî wan bip’ejirane, wê bê wat’eya r’edkirina yên dinê. Lewra jî dê ne r’ast bûya, eger mirov ewana di nava govekeke giştî da binirxandana.

Hem jî pirs bi wê diwartir dibe, ku hema-hema hemû zanîyar lêger’înen xwe li ser bingeha hinek agahîyên şewazî (formal) pêk tînin, ên ku ne ç’avkanî, ne jî motîvên p’eydabûna wana ne dîyar in, û mirov nikare bawerîya xwe bi wan bîne. Û eger mirov bi vî awahî pirsê binirxîne, wê demê dê heşmendîya pêşk’etinên bûyerên dîrokî yên xwezayî di sîyê da dimînin...

2. Lê, dîsa jî!

Her çî jî hebe, dibe ku, mirovê bikaribûya, bi r’êya analîz û hemberhevkerina pêvajoyên dîrokî yên wê serdemê dîmenên pêşveçûnên xwezayî yê bûyerên dîrokî jinûva banyaa ber ç’avan, û bi wê jî hema r’êya r’ast ji bo lêger’înen daneyên dîrokî hilbijarta.

Di vê derbarê da di dema xwe da r’ojilatzanê navdar ê sovêtî-r’ûsîyayî Î. M. Dyakonov dîtinên balk’êş anîne zimên, û wan dîtinan dikaribûn gelek hêlên vê pirsê r’onî bikirana. Weha, ew vê pirsgirêkê çawa dibîne: “... *Heya naha wê pirsê ferz dikin, k’a gelo ew peyker [“Avêsta”] di Medyayê da hetye nivîstin, an di deverêke Asîya Navîn da. Herdû nêr’înan jî, hem di nav zanîyarên sovêtî, hem jî di nav yên welatên dinê da t’erfdarên xwe hene.*

Wisa jî pirs dema nivîsîna beşên kevnar ên “Avêstayê” bê bersiv dimîne. Hinek lêger’îner dibêjin, ku Zerdeşt (Zoroastr)... hevdemîyê Vîştaspê I (salên 522 – 485 berî s. m.) ê bavê Darîûsê p’adşahê farsan e. ...Hinek lêger’înerên dinê pêkhatina kevnartirîn beşên “Avêstayê” diçihînin demên bêhtir kevn...” [8, rû. 50].

Belê, r’ewşeke t’evlihev a ne sade li holê ye!..



Lê, eger anlızeke r'exneyî ya wan agahîyan pêk hatibûya, yên ku di ç'avkanîyên kevnar û yên sedsalên navîn da hene, dê diyar bibûya, ku ewana ne anegorî heşmendîya pêşveçûna xwezayî ya bûyerên dîrokî û ne jî anegorî dîmenê giştî yê pêvajoyên dîrokî yên wê demê ne...

Dema mirov van hemû nêr'în, pêşdîtin û şaxên serpêhatîyan dinihêr'e, bêyî r'ayê mirov pirsek serî hiltîne: *"Ew çawa dikaribû, wisa bibûya, ku di dewra VI a berî s.m. mirovek ji p'er'ê r'ojhilatê yê dewleta hexamenîyan (ji Qazaxistan, Tacîkistan an Afxanîstana îroyîn) her'e-bigihîje "navçeyên bakûrî" yên wê dewletê, r'astî serdarê "wê deverê" bê, wî bine ser bawerîya xwe, û peyr'a bi alîk'arî û pişgirîya wî, bîrûbawerîya xwe di t'evahîya Îrana mezin da belav bike?"*

Xwendevan dê li vir bibêje, ku tiştên weha dikarin her t'enê di çîr'okan da pêk bînin!
 Û ewê r'ast be!

Ma ne, ol ne eşyayekî navmalê ye (xal-xalîçe, p'arçe an tiştên dine yên r'ojhilatî), ku mirov bikaribûya li ser piştê deveyan, bi r'êya hermûş ji p'er'ekî dewleta gewre bibira p'er'ê dinê, û bifirota.

Ma ne, ol şewazekî t'aybet ê hizira civakî ye û hebûna wê bi t'omerîya hinek norm, dua-dirozge, bawerî, r'ê û r'izmên olî û hevgerîtin û k'ombûna mirovan di civaka olî da heye... Û, ger mirov zimaanê civakê û r'abûn-r'ûniştin û kevneşopîyên wê nizanibe, gelo dê bikaribe (heya bi t'êorîkî) wan hemûyan di jîyanê da pêk bîne? Û, ew jî, di nîveka hezarsala yekem a berî serdema me!

Û, pirseke ne kêm girîng jî – serdarê herêmê (ew p'adişah be, an satrap!) çawa wisa bi hêsane derfîyê mala xwe li ber p'enaberekî bê cî û st'ar vekir, jî wî r'a dostanî kir, û li wî xwedî derk'et, piştovanîya wî kir? Ma, gelo wê dema (lo, hema îro jî!), p'enaberên bê cî û st'ar, ger'okekên sergedan dikaribûn wisa hêsa nêzîkî qesra p'adşê bibin, êdî ez di derbarê wê da nabêjim, ku bikaribe serbazî hundur' bibe?

Û, eger bi vê têgihîştina pîrsê li wan dîtin, nêr'în û şaxên serpêhatîyan binihêr'in û wanqa binirxînin, ew hemû dê wek holimaç'kên zar'okan ên bi k'artan çêkirî li dû hev yek

bi yek li ser hevdu da hilweşin...lewra ku, ew hemû hema di sêrî da li ser agahîyên hinartî an jî daneyên lêpovajîkirî hatine avakirin, ên ku ji bo girseyên wê serdemê (dewra VI a berî serdema me) hatibûne hinartin.

Eger em bibêjin, ku tîknolojîyên siyasî yên gemar t'enê di dîroka nû û nûtirîn da hebûne, emê bi binî va şaş bin.

Lêpovajîkirina agahîyên dîrokî û bi hev guhar'tina danayan hê di dema p'eydabûna dewleta yekem da hatine bik'aranîn... Û hê di k'ûrahîya dîroka kevnar da ewana jî hêla dewletên konkrêt, an jî ji hêla wan kesan va, hatine bik'aranîn, ên ku li ser r'êya avakirina dewleta xwe bûne.

Û lewra jî, ji bo lêger'inên dîroka serdemekê ya welatekî an gelekî konkrêt, divê mirov pêvajoyên pêşveçûna wê serdemê bi r'astîni bîne ber ç'avên xwe. Û, ji bo ku ew lêger'in, ên ku pêk tên, obyektîv bin, mercê pêwîst ew e, ku bi helwesteke r'exneyî nixandînen daneyên (matêriyal) dîrokî pêk bînin.

Û bi hev guhar'tina danayan û lêpovajîkirina agahîyên dîrokî di wê herêmê da hê wê demê destpê bûne, dema Quruşê (Quruşê II ê pêşer'ojê) t'or'inê Îştûvêgûyê p'adişahê Medyayê, bi malmezîna û giregirên bijarte yên nerazî û nedilxweş va şer'ekî k'irêt li dijî p'adişê dadixin, bi xayintî wî jî ser t'ext davêjin û desthilaatdarîyê di welêt da zevt dikin (dewra 550î ya berî serdema me). [1, 36 – 38; 8, r'û. 413 – 424; 27, XIX, r'û. 238 – 239; 18, r'û. 54 – 58 û Wik.]

Lê, ji talebext r'a, dema zanîyaran di warê dîroka gelên herêma erdnîgarî a berfireh a bi navê Îran da lêger'in pêk danîn, di bin destê wan da t'enê agahîyên ç'avkanîyên farsan hebûn (yên hexamenîyan, sasanîyan, pert'ewîyan û yên dinê), û beşê wan ê mezin li ser bingeha berhemên cihêr'eng ên zargotna gelêrî hatibûne nivîsîn, ên ku ji hêla "dîrokzan"- ç'irokbêjên qesra p'adişê va hatibûne hinartin (di derbarê mînakê a wêjeya "gelêrî" ya wisa da dê li jêrê bê gotin) û lewra jî, p'ir'ê caran gelek daneyên r'astîn ên dîrokî derî bala wan dimîne, û lêger'inên wana dijî heşmendîya pêşveçûna xwezayî ya bûyerên dîrokî dertên.

... Ew kevnêşopîyana îro jî bandora xwe li ser sazûna wat'eya sereke ya lêger'inên zanistî dikin... Ev mêtoda bûye prînsîpa "zanistî" ya dîroknûsiya fermî ya dewletên wek Îranê, T'irkîyaê û hinek welatên ereban. Û ew gelek caran heya xeta siyaseta wan dewletan jî dîyar dike.

Û gelek nimûneyên afrandinên "gelêrî" yên vî r'engî yên farsan (wisa jî yên ereban, t'irkan) ji hêla wan kesan va hatine hinartin, ên ku bi sazîkirina "zanista" dîrokî ya wan welatan va mijûl bûne.

Di dema xwe da lger'inên "zanistî" yên weke vana jî dîroknûsiya dewletê yên wan welatan r'a bûne bingeh, û îro doktrîna siyaseta fermî ya wan dewletan dîyar dikin.

Di van welatan da bi hêsane agahîyên dîrokî lêpovajî dikin, daneyan diguhêr'in, mîrasa çandî û dîrokî ya gelên dinê li ser xwe dinivîsîn û, bi vî awayî, dîroka xwe li ser r'edkirina dîroka gelên dinê ava dikin...

Weha, di dema xwe da nivîsk'ar û lêger'inêrê navdar ê k'urd ê sovêtî Nado Maxmûdov (Nadoyê Xudo) di vê derbarê da çî nivîsye: "...Di k'arê lêpikirina (sextekirin) agahîyan da, dibe ku, kesek nikaribe bi dîrokzanên faşîst ên t'irk û fars r'a bik'eve pêşbirkê. Ew dixwazin, gelê k'urd ji hêla siyasî û şan û şerefê va di r'ewşa bindest da bihêlin û di nav wî da xwetêgihîştina net'ewî bikujin". [29, r'û. 24 – 25]. – R'ast hatye gotin, lêbelê, divê bê zanîn, di wan welatan da bi lêpikirina dîrokê va ne t'enê dîrokzanên faşîst ên van demên dwîyê mijûl bûne, ya wan hema ji mêja wisa bûye...

Di r'ewşeke weha da ji vir û pêva mirov çî dikare bike? Mirov lêger'inên şopên wana li k'u pêk bîne? Ma gelo her tişt wisa bêşop winda bûye? – Hildane, lêpovajî kirine, guhar'tine, dîroka xelkê li ser xwe nivîsîne, ... bidawî bû û çû?

Û dilê mirov jî dêşe, ku ew "agahî", yên ku ji hêla lêpok'aran va hatibûne hinartin, paşê ji berhemên gelek lêger'inêrên welatên dinê r'a jî bûne bingeh...

Dibe ku, hinek lêger'inêran, dema berhemên bi zanistî lêp ên wan welatan xwendine, bi wan dijwar hatye, ku bersîvên r'ast ji bo wan pirsan bibînin, ên ku derk'etîne pêşîya wana. An ewana

ew hemû li şûna r'astîyan p'ejirandine? Lê, eger, li şûna wan ç'avkanîyan li ber destê wan ên dinê nînin? An ew nikarin li dijî kontsêpta "zanista" fermî ya wan welatan derk'evin, ji ber ku ew bi xwe nûnerîya zanista xwe ya fermî dikin?

Mirov evê çawa têbigihîje?

Wek ku tê xuyan, divê mirov sersedemên van nêr'inên cuda, yên ku îro di şaxên cuda ên jînegarîya P'êxember da hene, di vêderê da biger'e... Lêger'in dê dijwar bin, lê dê bêencam nînin...

Cêr'ibandinên pêşveçûna dîrokî ya zanistê didin xuyan, ku di dîroka mirovahîyê da hîç tiştêk jî bê şop winda nabe, ku zû, an dereng, her tiştêkî nehîni dibe r'astî!..

3. Bi vê helwestê jî emê lêger'inên xwe bidomînin.

Lêger'inên me yên zanistî didin xuyan, ku li vira pîrsa r'êgezî ew e, ka ev "serpêhatîyên" di derbarê pêwendîyên Zerdeşt P'êxember ên bi wan herdu serdarên navborî r'a (herdu jî – Vîştaspa!), di derbarê xwedîderk'etin û piştovaniya wana di k'arê belavkirina zerdeştîyê da çiqasî dik'eve heşê mirov? K'a ev hemû çiqasî anegorî heşmendî û demnûsîya (k'ronologi) pêşveçûna dîrokî û p'êwendîyên civakî yên wê demê ne?

K'a, em careke dinê vege'rin ser wê pîrsê, ku di wan herdu şaxên "jînenîgarîya" Zerdeşt P'êxember da du serdar hene, û herdu jî navê xwe Vîştaspa ne. Anegorî wan şaxên "jînenîgarîyê", yek ji wan "p'adişahê" Baktrîyê bûye – li p'er'ê dewletê yê r'ojihilatê, lê yê dinê serdarê "herêma wê yên bakûrî" bûye...

Û hinek lêger'iner hewl didin bidin bawerîkirin, ku piştovanê Zerdeşt Goştaspê (Vîştaspa) serdarê Baktrîyê bûye, lê ên dinê dibêjin, ku ew Vîştaspayê serdarê herêma bakûrî bûye.

Ji bo ku bê zanîn, k'a k'îjanî ji wana dikaribû (bi t'exmînî) bibûya piştovanê Zerdeût P'êxember, divê bê dîyarkirin, k'a ji wan t'exmînan k'îjan anegorî r'astîyên wê serdemê ye?

Eger ji me r'a li hev bê, bersîva wê pîrsê ya r'ast bibînin, wê demê emê li ser r'êya r'avekirina wê pîrsê gava xwe ya yekem bavêjin, k'a P'êxember li k'u erk'a xwe pêk ane û herêma belavbûna destpêkî ya bîrûbawerîya zerdeştîyê k'îjan bûye. Û, eger bersîva van pîrsan bê dîtin, wê demê mirovê bizanibe, k'a çiyê jidayibûna Zerdeşt p'êxember li k'u bûye.

K'a, em ji Gûştaspê (Vîştaspa) serdarê Baktrîyê destpê bikin.

Di derbarê wî da tê zanîn, ku, piştî wê, dema sala 465an a berî serdema me di encama delk' û dolaba qesrê Xşayarşayê (خشایارشاه) p'adşshê farîzan û Darîûsê (داریوش) lawê wî yê nuxurî tîn kuştin, lawê wî yê dinê, Erdeşîr (اردشیر), yê ku di dîrokê da wek Ardeşîrê I tê zanî, r'adibe ser t'ext. ... Wisa jî tê zanîn, ku Erdeşîr di p'evçûna di qesrê da Artabanê serokê p'arastina p'adşê û Aspamîtrayê serokê herema p'adişê dikuje. Lê sala 464an a berî serdema me Gûştaspê (Vîştaspa) birayê Erdeşîr, satrapê (walî) Baktrîyê li dijî wî serî hildide, têk diçe û tê kuştin. Piştî wê jî metirsîya derbeya hindur'in (ya qesrê), Erdeşîr fermanê dide, ku biryê wî yê dine jî bikujin...

Li vira ya balk'êş ew e, ku ev bexter'eşîya malbetî dîroka xwe ya berî van bûyera jî hebûye: di dema xwe da (s. 478 b.s.m.) Xşayarşayê bavê wana jî bi heman r'êbazê li hember Masîstayê biraayê xwe t'evdiger'e. Wê demê Masîsta jî satrapê Baktrîyê bûye, û ew jî hewl dide, li dijî birayê xwe serî hilde û tê kuştin...

Belê-ê-ê, bi r'astî jî binemala p'adişê bext'r'eş bûye, dîroka wan dîrokeke xwîn'r'êjî bûye – t'uje bi xiyanet, delk' û dolab, derbe û kuştinan!

Û li vira pîrs dertê hole: "Ma, di r'ewşeke weha da, dema di qesrê da û li derdorên wê her kes amade bûne, û t'enê benda demê bûne, ku hev t'une bikin, gelo yek ji wan dê bikaribûya dilovanîyê û xêran bike û heya piştovaniya mirovekî nenas bike, yê ku erk'a p'yamdarîya olî pêk tîne, û alik'arîyê bide wî, ku ew oleke ne nas di nav gel da belav bike? – Ew jî wê demê, dema Gûştasp bi xwe ne ku p'adişah bûye, lê her t'enê satrapek bûye, ew jî di demeke p'ir' kurt da!"

Li ber ç'avan e, ku heşmendîya pêkhatina bûyerên dîrokî û danayan di derbarê wê nêr'înê da t'u govaniyê nadin, ku, xwedêgiravî, Gûştaspê satrapê Baktrîyê piştovaniya Zerdeşt p'êxember kiribe!

Ji bilî vê, wisa jî dane û bûyerên dinê jî li dijî vê nêr'înê ne: tê zanîn, ku navê hîç serdarekî jî binemala hexamenîyan di "Avêstayê" da nayê bîranîn, yê ku piştî sala 550î ya berî s.m. r'êvebirîya welêt pêkanîne. Ango, Zerdeşt p'êxember berî serdema hexamenîyan jîyaye û erk'a xwe ya p'eyamdarîyê pêk anîye û nikaribûye r'astî wî satrapî bihata, yê ku bira û hevdehiyê Erdeşîrê I bûye. Û Erdeşîr jî, wek ku tê zanîn, di navnîşa serdarên hexamenîyan da p'adişahê şeşem bûye (s. 464 – 425 berî s.m.)... [8, r'û.47 – 54; 27, berg 22^A, r'û. 881 – 884; 18, r'û. 56].

4. Serpêhatîya Kavî Vîştaspa.

Hinek ç'avkanî wî wek "serdarê herêmên bakûrî" bi bîr tînin, û, xwedêgiravî, Zerdeşt p'êxember, dema bê cî û st'ar li ser r'êyan bûye, ew anîye ser bîrûbawerîya xwe, lê di beşên cuda yê "Avêstayê" da Kavî Vîştaspa piştovanê p'adişahî û dostê Zerdeşt hatye navkirin, yê ku r'abûye ser r'êya r'astyê û li dû bawerîya yê R'izgarîdar çûye.

Weha, di "Gatên Zerdeşt" da çî tê gotin:

"Divê mirov berê pêşin dostê wisa baş nas bike? – Zerdeşt P'êxember bi xwe pîrsa hrêtorîk dide û bi xwe jî bersîva wê dide. – Helbet, ew piştovanê p'adişahî ye, ew serok (kavî) Vîştasp e.

Ez bi pesnbêjîyên Ahûra-Mazda û bi R'amana Qenc ji bo wî dibêjim". [4, r'û. 123].

Û - dîsa:

"Wisa Kavî-Vîştaspa

Bi Desthilata vê yekîtîyê gihîşt,

Li ser r'êya r'astîya Bîrûbawerîyê

Bi Zanînen Qenc derdik'ete pêş:

Bila Mazda Ahûrayê pîroz

Ya me bi r'ayê xwe bîne sêrî!"

"Kavî-Vîştaspa p'adişahê yekem bûye, yê ku li Zerdeşt P'êxember xwedî derk'etye û Bîrûbawerîya wî di nav gel da belavkirye". [4, r'û. 153] – Bala xwe bidinê, Zerdeşt Kavî Vîştaspa serok nav dike!

Îro êdî di dilê kesekî da guman nemaye, ku Kavî Vîştaspa piştovanê Zerdeşt û belavkarê bîrûbawerîya wî bûye. [wisa jî li: 19, r'û. 62 – 63 binihêr'in].

Lê, dîsa jî, di ç'avkanîyên cuda û gotarên êntîklopêdîk da tê gotin, ku ne welatê ku Vîštaasta p'adişahî lê kirye, ne dema jîyaana wî nayên zanîn, her çiqas kesek bi guman li hebûna wî ya r'astî nanihêr'e...

Bi r'astî jî, gotineke balkêş e!

Ma, ev ne paradok's e?

Ma tişteki wisa dikre bibe, ku mirov serdarîyê dewleteke gewre kiribe, xêr û dilovanî k'arê wî bûbin, piştovanî li P'êxember kiribe, lê di derbarê wî da tişteki hêjayî bawerîyê dîyar nînbe?

Ev nak'okîya ji k'u tê? Ma ne agahîyên dîrokî yê bêhtir pêbawer hene, lê zanîyar bi t'u awayî "nikarin" şopên dewleta ku bi r'astî hebûye, p'adişah û p'êxemberê wê bibînin, bibînin?..

Belê, helbet, hîç tişteki dê dîyar nînbe, eger di dîroka dorîzemanan da her tişt wisa lêpovajî kiriibin, ku dîroka dewleteke gewre, ya ku bi r'êalî hebûye û p'adişahê wê jî mîrekî bavçê û comerd bûye, kiribin efsaneya xewner'ojk û xiyalên sedsalên navîn!

Û paradok'seke dine jî: *di hinek ç'avkanîyan da Vîştaspa wek p'adişahê nebînayî û bêhemp'a, têk'osêrê ji bo bawerîya r'astî û dadwerîyê didin nasîn, bi t'aybet lehegîya wî*

serbazîyê didin xuyan, lê di hinek cîhên dinê da ç'avnêbiharî û sewdaserîyê bi nave wî va datînin... [16, r'û. 281; 17, r'û. 198 û 282 û Wik.].

Û, ev nak'okîyên weha di van agahî, nêr'în û dîtinan da ji k'u tèn?

Lêbelê, eger van “t'aybetmendîyên”

Viştaspa hemberî wê mîfa (efsane) farsan û serpêhatîya keldanîyan ên di derbarê p'adişahekî Medyayê yê dinê, Îştûvêgû (Astîag) bikin, ên ku Movsês Xorênat'sî di “Dîroka Ermenîstanê” da bi cî kiribûne (di derbarê wan da – li jêrê!), wê demê her tiştê bê têgihîştin.

Her çiqas, piştî ku Qurûş di Medyayê da desthilatdarî bi xayîntî zevt kir, r'êvebirên fars ên nûpêketî li ser asta dewletê bi berekêva demnûsîya (k'ronologî) dîrokê lêpovajî jî kirine, hemû dane û nav bi hev guhar'tine, mîrasa dîrokî û çandî ya gelê med (=k'urd) li ser xwe nivîsîne, dîsa jî, îro mirov dikare gelek şopên dîroka r'astî bibîne.

...Guhar'tina dane û navan, û lêpovajîkirina agahîyên di derbarê bûyerên dîrokî da hîç demekê jî r'anewestyane. Ewana ji bo mêtoda “zanistî” ya dîroka fermî û siyaseta dewletê yên wan welatan bûne bingeh.

Û îro ne t'enê cîyê matmayîne ye, ku di cîhanê da êdî bi berekê va hînî wan t'êorîyên zanista lêp dîbin, lê her weha, mirov xemgîn dibe, ku wisa jî lêger'inerên welatên şaristanî bi hêsane ew agahîyên lêpovajîkirî di berhemên xwe yên zanistî da wek ç'avkanîyên pêbawer bi k'ar anîne û îro jî bi k'ar tînin.


Helbet, ewana wan agahîyan bi k'ar tînin, yên ku li ber destê wana hene, lê ji bilî ç'avkanîyên farsan tiştêkî dinê li bal wana nine. Lê hinek lêger'iner hewl didin, ku sînorên wan “normên” zanistî derbaz nekin, ên ji hêla dewletê va ji bo pêkanîna lêger'înên hatine p'ejirandin?..

Di encama nêzîkbûneke weha da îro ewqas r'ûpelên ne dîyar ên dîrokên gelên vê herême hene.

Û lewra jî, ji bo dîrok nebe demnûsîya (k'ronologî) p'aradoksên sedsalên navîn, ji bo ku bûyerên dîrokî êdî wek efsane-ç'îrokan neyên xuyan, ji bo ku mirov tê bigihîje, k'a bi r'astî di derbarê çî da tê gotin, divê mirov tayê pêşveçûna heşmendî ya dîrokî bibîne, bi wî pêşva her'e, û yek bi yek, p'arç'e bi p'arç'e, dîmenê giştî yê bûyerên dîrokî yên wê demê ji nûva vejînin.

Lê mirov çawa bike, eger daneyên dîrokî heya wê r'adeyê hatine berovajîkirin, ku p'ir' dijwar e wana vejînin? Mirov çawa bike, dema bi hezarsalan li dû hev hemû danayên dîrokî lêpovajî kirine û gîhandine wê astê, ku dijwar e, heya, hîç nebe, mirov bikaribe bi texmînî dîmenê bûyerên demên bihrî bîne ber ç'avan?





5. Lêbelê, ...

Eger mirov bala xwe bidê, r’astî ew e, ku cîhan û dîroka mirovahîyê t’ênê bi Îranê (Fars) bisînor nabe, û bêhtir fireh li cîhanê binîhêr’e, dê bikaribe gelek agahîyan bibîne, yên ku têk’îlîyên xwe bi wê herêma cîhanê r’a hne. Ma ne, ji bilî wê herêmê gel û welatên dinê jî hene – mezin an biç’ûk. Ma ne, gelek agahîyên balk’êş di peykerên wan ên nivîskî da jî hatine p’arastin... Beşekî wan ç’avkanîyan hatine lêger’andin, lê beşê dinê hê benda dema xwe ne... Û, heya mirovê bikaribe gelek agahîyên balk’êş di wan destnivîsan da jî bibîne, yên ku ji hêla hineke dinê va êdî hatine lêger’andin ...

Bi t’aybetî jî destnivîsên ermenîyan ên kevnar dikarin kêrî vê mijarê bên. Di wan destnivîsan da gelek agahîyên hêja hatine p’arastin û hatine-gihştine dema me, yên ku dikarin ne ku t’ênê kêrî lêger’inên dîroka gelê ermenî bi xwe bîn, lê, her weha, kêrî lêger’inên dîroka gel û welatên dinê yên herêmê jî, yên weke: med-k’urdan, asorîyan, farsan (hexamanîyan, sasanîyan, p’ert’ewîyan) û yên dinê bîn. Lêger’inên wan dikaribûn gelek r’ûpelên tarî yên serdemên cuda r’onîbikirana... Û di nav wan destnivîsan da ji bo lêger’inên zanistî ya here balk’êş serekç’avkanîya dîroka armenîyan berhema Movsês Xorênat’sî ya “Dîroka Ermenîstanê” ye (dewra V a s.m.).

Di vê p’irtûkê da mîfeke (efsane) farsan a di derbarê Îştûvêgûyê P’ir’hespî (erm. Բյուրասուսի Աճախախ/Byuraspi Aždahak) yê p’adişahê Medyayê da heye. Ev mîfa delîleke li ber ç’avan a wê yekê ye, k’a çawa di cîhana kevnar da tîknolojîyên siyasî yê gemar hatine bik’aranîn. Û, ya balk’êş ew e, her çiqas Movsês Xorênat’sî neç’ar bûye, wê mîfê di p’irtûka xwe da binivîse jî, lêbelê, bi wê r’a wisa jî helwesta xwe ya neyînî li hember wê r’êz kirye, û ew tişteki *vala, bêwat’e û bêkêr* nav kirye. [30, r’û. 89 - 92].

Lê, ji bo ku her tişt baş bê tîgîştin, em ji dîroka nivîsîna vê p’irtûkê destpê bikin.

Xorênat’sî “Dîroka Ermenîstanê” bi daxwaz û spartîna Sahak Bagratûnîyê serekfermandar, r’êvebir û mîkênasê (*Maecenas*) ermenî yê dewra V a berî s.m. nivîsyê. Û, lewra jî, ew evê p’irtûkê bi bangawazîya xwe ya berbi wî destpêdike: “*Min di daxweza te ya bêhemp’a da ew diyariya qencî û dilovaniya xwedayî ya bêdawî, a li ser te da hatye, û bandora r’ewanî ya bê r’awestan li ser r’amanên te dîtin; dema min ji didara te zêdetir*

r'ewanê te nas kir...” – Û ev şewazê nivîsînê di p'irtûkê da heya dawîyê didome: û di wê navberê da bi şirove û danezanan ew gelek caran berbirî Sahak dibe, an nêr'înên xwe tîne zimên...

Û çaxê ku dem pêr'a digihîje, û ew divê bi ferzkirina Sahak wê mîfa (efsane) farsan a navborî ya di derbarê Îştûvêgûyê P'ir'hespî (erm. Բյուրասպի Աճախաղ/Byuraspi Aždahak) da di p'irtûka xwe da bi cî bike, ew ne t'enê helwesta xwe ya neyînî li hember wê dîyar dike, lê wisa jî, wek ku ber xwe bide, bi Sahak r'a dik'eve nava gengeşîyan: “... Çi pêdivîya te bi van ç'îr'okên bêwat'e heye, an jî tuyê çî ji van gotinên bêwat'e û bêkêr bikî?... Lewra, ji bilî wê, ew (fars) bi xwe jî wan hemûyan tê nagihîjin...” [30, r'û. 89 - 92].

... Lê, dema piştî berxwedaneke weha, ew dîsa neç'ar dibe wê mîfê di p'irtûka xwe ya “Dîroka Ermenîstanê” da bi cî bike, ew wê di dawîya p'irtûka yekem da datîne (ew jî sê p'irtûkan pêk tê), wek pêvekekê, û li wira jî, bi wê r'a wisa jî serpêhatyêke dinê ya di derbarê heman Îştûvêgûyê P'ir'hespî yê p'adişahê Medyayê da dinivîse, ya ku ewî “...di p'irtûkeke keldanîyan da dîtîbûye...”

“Ev çî xwestek e, gelo, ku tu² li hember wan mîfên³ bêkêr û bêcûre yên di derbarê Ajdahakê Byüraspi da didî pêş? – Xorênatsî dinivîse. – An jî, tu ji bo xatirê çî me bi van ç'îrokên farsan ên bêwat'e û bêtem va mijûl dikî, an çêtir e, mirov bibêje – bi wan ç'îrokên di derbarê qencîyên wî yên ne qenc da, di derbarê wê da, ku dêwan xizmeta wî kirine, ku ewî nikarîbûye r'astîyê û derewan ji hev cuda bike, ku dêwan sergirkên milên wî maç'kirine, û ji wan zîya derk'etine...”

...Ji bilî van ...îro ez p'eyv û gotinên wan bi destê xwe dinivîsim, ên ku em ji wan nefret dikin, heya mirov ji demgê wan jî zivêr dibe: – ez wat'eyê didim gotinên wan ên bêwat'e û bûyerên wan ên p'ir' kevn, ên ku ew bi xwe jî tê nagihîjin, weha, ez şirove dikim, her t'enê bila dilê te şad bikim an k'arekê bigihînim te. Lê tu divê nefreta meye li hebar wan gotegotan bizanîbî, lewra jî me di p'irtûka xwe yekem da cih neda wan, ne jî di beşê dawîyê da, lê em ewê di cîhekî dinê yê cuda da datînin. Û ezê weha destpêbikim.

...Min ew di p'irtûka keldanîyan da dîtye... Ewî (Astîyag/Ajdahak/Uđñuhwulj. – E. C.) gotye, ku divê hemû fêrî jiyana bi şewazekî ya hevbeş bibin, ku divê hebûna kesekî ya cuda nîbe, lê divê her tiştî ji bo hemûyan giştî-t'omerî be. Her gotineke wî, her k'arekî wî vekirî, li ber ç'avan bûye. T'u r'amanên wî yên bi dizî û veşartî nînbûne, û her tiştê ku di dilê wî da hebûye, ewî li ber hemûyan vekirî anye zimên: û ewî bir'yar dabûye, ku mafê dostan heye, şev û r'oj bik'evin bal wî û derên. Û ev jî, wek ku tê gotin, qencîya wî ya neqenc bûye” [30, r'û. 89 - 92].

Balk'êş e, ne? Ma, Îştûvêgû di t'evahîya dîroka mirovahîyê da çî ne serk'êşê r'amana wekhevîya sot'silî bûye?! Wek ku tê xuyan, hema ev jî bûye sedema wê, ku mirovên nêzik xîyanet li wî kirin, bûne hevkar û hevparên derbek'aran û bi wê yekê di dîroka Împêratorîya Medyayê da xala dawîyê danîn...

Qey bibêjî, her tişt hatye gotin, t'enê pêwîst e, ku mirov ewan hemûyan r'ast têbigihîjin û r'avebikin, bi t'aybet jî, ya ku Xorênat'sî vekirî dibêje, ku ew bi xwe neç'ar bûye, wan hemû gotinan binivîse, yên ku ew ji wan zivêr e û nefretê li wan dike, yên ku heya dengê wan jî li guhên wî zid bûne,... ku ew neç'ar bûye, wat'eyê dide ç'îrokên kevn ên wan (farsan) ên bêwat'e, ên ku ew (fars) bi xwe jî tê nagihîjin, her t'enê bila dilê Sahak Bagratînî şad bike an k'arekê bide wî.

Weha, ev e sedema sereke (lêytmotîv) ya nivîsîna vê mîfê (efsane)!

Û peyr'a jî ew gengeşîya xwe bi Sahak r'a didomîne û nêr'îna xwe tîne zimên: “... Çi pêdivîya te bi van ç'îrokên bêwat'e heye, an jî t'uuyê çî ji van gotinên bêwat'e û bêkêr bikî? Ma, gelo, ev mîfên yewnanîyan in, ên ku bêhemp'a, çê û bi wat'e ne, û di wan da bi şewazekî cudabêjî r'astî veşartî ye? Lê tu dibêjî, ku em ewên bê wat'e bi wat'e bikin û şewazekî bidin bêşewazîyên wan. Ez heman tiştî dubare dibêjim te, çî pêdivîya te bi wan heye? Û ev çî

daxwezî ye –tiştê ku kesek naxwaze, tu dixwazî û k'arê me giran dikî? Lê em dibêjin, ku ev xwastekên te ji t'emenê te ye ciwan û ji wê tê, ku tu hê t'am negihîştî. Ji bo wê jî, bila li vir jî em xwesteka te pêk bênin û armanca te binin sêrî". [30, r'û. 89 - 92].

Dibe ku Movsês Xorênat'sî wê demê serva jî neçûbe, k'a Sahak Bagratûnî ji bo çî wisa bi bir'yar ferz dike, ku ew wê ç'îrokê di "*Dîroka Ermenîstanê*" da ci bike, û lewra jî, dibe ku, ewî wisa berxwe daye, bi wî r'a k'etye nava gengeşîyan, û ew hemû bi t'emenê wî yê ciwan, û t'am negihîştîbûna wî şirove kirye?...

Lê, eger, ew ferzkirina Sahak hîç jî ne ji "*t'emenê wî yê ciwan û t'am negihîştîbûna*" wî bûye?... Ma ne, ew serbaz û r'êvebirek bûye. Û, ger wisan e, divê ew siyasetmederekî pişpor bi dûrdîtî bûya jî! Lê, eger Sahak, wek siyasetmeder, têdighîje, ku ev ç'îrok, ên ku dûrî heş û sewdayê mirov in, di r'astîya xwe da Qurûş ê II bi t'erefdarên xwe va, dema amadekirina derbeya dijî kalikê xwe – p'adişahê dawîyê yê Medyayê Astîyag/Îştûvêgû// Ajdahak, ji ber xwe derxistine û di nav gel da belav kirine,...û wê demê (piştî hazar salî) pêdivîya Sahak Bagratûnî jî bi wê mîfê hebûye– di hinek armancên xwe yên siyasî ên dîre dirêj da? An bi xwe jî yek ji wan bûye?

Pirs in, pirs in, pirs in, pirs!

Bersivên van û pirsên dinê hê paşê dê lêger'inerên pêşer'ojê bibînin...

Lê mirov li vira û naha çî kdîare bibêje?

Mirov bibêje, ku hemû gotinên Movsês Xorênat'sî r'ast hatine têgihîştin?

Na, na, û ev jî ne hemû ye!

Movsês Xorênat'sî vekirî helwesta xwe li hemberî wê mîfê tîne zimên, û bi lîstika p'eyvan, wek cudabêjîyekê (*alegory*) wek "*...di beyt'-serhatîyên yewnaîyan ên lehengî da*" r'astîya tiştan ji bo nivşên pêşer'ojê r'adigihîne... Û li ser r'ûpelên p'irtûka wî vekirî du helwestên dijber dertên hember hev: xweşbînîya Xorênat'sî li hember r'astîya di derbarê Îştûvêgûyê P'ir'hespî da (*a ku ewî di p'irtûka keledanîyann dîtîbûye!*), û bêdilîya wî ya li hember wê mîfa bêkêr a farsan a di derbarê tiştên bûyî-nebûyî da, ku ji bo di p'irtûkê da cîkirina wê, Sahak Bagratûnî ewqas ferzkiribûye. Weha, Xorênat'sî ewê çawa şirove dike: "*... Ewî (Îştûvêgû//Astîyag//Ajdahak//Udîhuhulî. – E. C.) gotye, ku divê hemû fêrî jîyana bi şewazekî hevbeş bibin, ku divê hebûna kesekî ya cuda nîbe, lê divê her tişt ji bo hemûyan giştî-t'omerî be. Her gotineke wî, her k'arekî wî vekirî, li ber ç'avan bûye. T'u r'amanên wî yên bi dizî û veşartî nînbûne, û her tiştê ku di dilê wî da hebûye, ewî li ber hemûyan vekirî anye zimên: û ewî bir'yar dabûye, ku mafê dostan heye, bi şev û r'oj bikevin bal wî û derên. Û ev jî, wek ku tê gotin, qencîya wî ya neqenc bûye*"

Li ber ç'avan e, ku Movsês Xorênat'sî her tişt dizanibûye, lêbelê, hewl daye, anegorî derfetên heyî, hem yê sparîşda (Sahak Bagratûnî) nexeydîne, hem jî bi cudabêjîyekê (*alegory*) r'astîya tiştan r'agihîne, bi wê hêvîyê, ku xwendevanê bi xwe wê bibîne û têbigihîje.

Û, eger mirov vê gotina Movsês Xorênat'sî ya "*Û ev jî, ... qencîya wî ya neqenc bûye*", r'ast têbigihîje, – qey bibêjî, ew berê xwendevan dide r'asttêgihîştina gotinên xwe. Lê, heyf, piştî 1500 salî, ewên ku weşana r'ûsî ya vê peykera dîrokî amade kirine, ev hemû her t'enê wek "*peyvlistik*" nav kirine. Û di nasîya 179-an a vê ç'îrokê da ew wê weha şirove dikin: "*Bûyerên... nebûyî*" – "*r'agîhandîneke bi lîstika p'eyvan a mîna orijînalê ye*". – û peyr'a jî di heman beşê wergerê da tiştên weke van gotinan dinivîse: "*qencîya neqenc*", "*ji r'ê derxistina yên jir'êderk'etî*", "*tiştên bê şewaz bi şewaz kirin*" û wana wek lîstika p'eyvan dide zanîn... Lê di r'astîya xwe da ev hemû hema wisa "*lîstika p'eyvan*" nînin, di bin her gotineke weha da ji bo xwendevanê dihatûyê p'eyamek veşartî heye... [31, şiroveya 179, a p'irtûka I].

Û, eger wê demê gotinên Movsês Xorênat'sîyê bavê dîroka ermenîyan r'ast hatibûna têgihîştin û r'avekirin, îro r'ewşê dê ji binva cûr'ekî dinê bûya...

Li vira tiştêkî dinê jî balk'êş e: ew, çî ku di mîfa farsan a di derbarê Îştûvêgû (Astîyag) da tê gotin û çî ku di serhatîya "keldanîyan" da dîsa di derbarê wî da hene (li jorê binihêr'in!), ne r'astêdêr wan nêr'inên dûrî heş û sewdayê mirov (ên paradok's) ên di

derbarê Kavî Vîştaspa da r'onî dkin, li k'u tê gotin: “*di hinek nivîsan da Vîştaspa wek p'adişahelî nebînayî (îdêalî), têk'oşer'ê ji bo bawerîya r'astî û qenc û dilovan didin xuyan, bi t'aybetî lehengîya wî ya leşkerî tînin zimên, lê di cîyên dinê da, t'aybetîyên çavnebihariyê û sewdaseriyê bi navê wî va datînin...*”

Ev mîfa nîmûneyeke tîknolojîyên gemarî ya xuya ye, ya ku ji hêla serdarên farsan va li hember rêvebirên medan û bi giştî li hember gelê med bikaranîne (xwe farsên sade tiştên wisa nikaribûne ji ber xwe derxin?) ...

Û ji bilî vê. Ew, ku piştî bêhtirî hezar salî pey derbeya Quruş r'a (destpêka dewra VI – nîveka dewra V a s.m.), her çiqas dijberîya du helwestên cuda li hember wê mîfê hebûne jî (ya Movsês Xorênatî û ya Sahak Bagratûnî), dîsa ewê, wek hêmaneke tîknolojîya siyasî, aktûalîya xwe winda nekiryê.

Û p'irseke ne kên girîng jî: di van t'aybetîyên Kavî Vîştaspa û Îştîvêgûyê P'ir'hrspî da gelek tiştên mîna hev hene... Çima? Gelo ne ji ber wê ye, ku ç'avkanîyên herduyan jî yek bûne?

Û p'irseke dine jî: ermenîyan jimêjva hem med, hem jî k'urd vîşapazûn navkirine (erm. վիշապազուն/visapazun), anglo, peyhatîyên zîyê, ji t'ûr'a zîyê)


Weha, heman Movsês Xorênat'î di cîyekî dinê yê “Dîroka” xwe da di vê derbarê da çî dinivîse: “... *Di nav wan (ermenîyên herêma Goxtinê. – E. C.) da stran hene, yên ku di derbarê Artasês û lawên wî da dibêjin û wisa jî di derbarê peyhatîyên Ajdahak da (Astîag/Îştîvêgû. – E. C.) bi bîr tînin û ji wan r'a bi awayekî lomeyî dibêjin yên ji t'ûr'a zîyê (di orîjînalê ermenî da – վիշապազուն/visapazun. – E. C.), ji ber ku p'eyva Ajdahak di zîmanê me da tê wat'eya zîya...*” [30, r'û. 84].

Lê S. V. Têr – Manvêlyanê erk'darê olî yê ermenî-xrîstyanî yê destpêka dewra XX beşê yekem ê p'irtûka xwe ya “Kurmancên yêzîdî” weha navkirye: “Bi kurtebînî di derbarê kurmancên yêzîdî yên vîşapazûn da”, lê beşê hevtem – “Êtîmolojîya net'ewnavê medên vîşapazûn”. [31, r'û. 38].

Di heman p'irtûkê da S. V. Têr – Manvêlyan, dema di derbarê k'urdên êzdî da dinivîse, dem bi dem navê wan bi van p'eyvan r'a tîne: “peyhatîyên medên kevnar”, “peyhatîyên Êkbatanê”, “peyhatîyên medan”, “peyhatîyên medên vîşapazûn”. “şaxê Îştîvêgûyê medî yê leheng” û yê dinê. [bi hûrbînî– di 15 da].

Di dîroknûsî û demnûsîyên ermenîyan da hinek navên tîk'îlîdarî Medya kevnar bi sedemên cuda bi awayekî lêpovajîkirî hatine nivîsîn. Ewana Medyayê Marastan nav kirne û îrojî wisa nav dikin, medan – mar, Îştîvêgû – Ajdahak/Aşdahak, lê Îştîvêgûyê P'ir'herspî yê Vîştaspazûn (ê ji bînemala Vîştasp) – Ajdahakê P'ir'herspî yê vîşapazûn (ê ji t'ûr'a zîyê)... Ji ber ku r'avekirina van p'eyvan a dîrokî-êtîmolojî ne armanca vê gotarê ye, lewra jî, xwendevanê bikaribin di derbarê r'avekirina êtîmolojîya van p'eyvan da di gotara xudanê van r'êzan a “Lê k'a, êdî r'astî li k'u ma?” da bixwînin [13.], lê ezê li vîra p'eyva ermenî ya vîşapazûn (վիշապազուն/visapazun) bi êtîmolojî r'avebikim.

Li ser bîngeha hemberhevkirina wan agaahîyan, ên ku li ber destê min hebûn bi encamên analîzên êtîmolojî û p'eyvzanîyî-p'ayvsazîyê dertê holê, ku ev p'eyva t'u p'êwendîya xw bi p'eyva ermenî ya vîşap (վիշապ/visap – zya) r'a nîne. Ev şêwazê lêpovajîkirî yê navê Vîştaspayê p'adişahê Medya kevnar e. Ermenîyan med-k'urd wek peyhatîyên/jî binemala Vîştasp zanibûne, lewra ku Vîştasp sembola bêhemp'atî, comerdî û serbilindîya nivşa medan bûye û gelek caran naavê wî wek navê gelê med û dewleta wî bik'aranîne. Û heşmendî ye, ku ermenîyan hema di sêrî da med (k'urd) wek ên ji t'ûr'a Vîştaspa (վիշապազուն/visaspazun) hejmartine, anglo, peyhatîyên Vîştaspa. Û, lewra ku, heya dewra XVI ermenîyan gotine k'urd, mabesta wan med bûne, gotina med, mabesta wan k'urd bûne [13. û 15.], lewra jî, wek ku ji bo ermenîyan med peyhatîyên Vîştaspa bûne, wisa jî – k'urd. **Û - r'astîyeke balkêş:** her çiqas farsan bi r'êya delk' û dolaban, bi r'êya derbeyê di Medyayê da desthilatdarî hildane destê xwe, li ser bîngeha wê dewleta xwe ava kirine, bi wê yekê bûne mîratxur û dûmahîya Împêratorîya Medyayê jî, lêbelê ermenîyan t'u carê fars wek med nasnekirine...



6. R’astiyên dîrokî û têgehên lêpovajîkîrî.

Tê zanîn, ku r’astî û têgehên serdema derokî ya konkrêt grêft’erî hev in, ku r’astiyên dîrokî, têgehên anegorî xwe disêwirînin.

Û, eger ji wê hêlê va li wan pêvajoyên dîrokî yê mijara lêger’înên me binihêr’in, dê dîyar bibe, ku têgehên çandî, olî, bîrdozî û yê dinê li ser bingeha wan r’astiyên dîrokî çêbûne, yê ku di wê dema konkrêt da hebûne. Anegorî mercên wê demê yê konkrêt jî ewan têgehana şewazên xwe yê zimani wergirtine (p’eyv). Lê di jîyanê da her tişt têk’ilîdarî hev in: gelek caran guhar’tîna p’eyvê ya dengsazî yan ya bêjesazî di wat’eya wê da jî tèn xuyan, ango, bandora xwe li ser têgehê bi xwe dihêlin.

Û li vîra, eger em, bêyî ku t’aybetiyên wan pêvajoyan li ber ç’avan bigirin, vege’r’in ser pîrsa jêdera p’eyva ermenî ya *vişapazûn* (վիշապազուն/*vişapazun*), dijwar mirov bikaribe bersîên pîrsên heyî bibîne...

Û lewra jî, ji bo destpêkê, ez di ferhengên zimanê ermenî da li wan p’eyvên têk’el ger’yam, yê ku bi sazîya xwe va mîna p’eyva navborî ne, ango, bi alîk’arîya paşdaçeka (*w)qnlû/(a)zun* hatine sêwirandin, û di encamê da min t’enê çar p’eyv dîtî.

Eger mirov baş lê binihêr’e, dê bikaribe bibîne, ku bi alîk’arîya paşdaçeka navborî p’eyvên cuda ev wetayana wergirtine: “*ji nivşa yekî/hinekân*”, “*ji nivşekê*”, û piştî wê ewan p’eyvana wateyên “*yê/yên asta bilind*”, “*mîrovên xwedî asta comerdîya bilind*”, “*yên ji binemala p’adişê, t’or’înan*”, an “*yên efsanewî, xwedayî*”:

1. արքայազուն/ark’ayazun – şahzade, prînt’s, ji binemala p’adişê [32, r’û. 251; 33, r’û. 1148];

2. իշխանազուն/işxanazun – ji nivşa t’or’înan (t’orînî), ji malmezînan; [32, r’û. 344; 33, r’û. 502];

3. դյուցազուն/dyucazun – lehengê efsanewî, yê xwedêdayî, nîvxwedê, leheng [32, r’û. 522; 33, r’û. 306];

Lê p’eyva çarem a: ***վիշապազուն/*vişapazun** – yê/ya ji nivşa zîyan [32, r’û. 415; 33, r’û. 1392], bi t’u pîvanan (paramêtre) ne anegorî heşmendîya wat’eya destpêkî ya vê paşdaçekê ye.

Û lewra jî, pirs dertê hole: “Ma, di k’îjan mîtolojiyê da agahîyeke wisa heye, ku zîya *sembola comerdiyê û serbilindiyê be?*” – Ew mirov, ê ku hema piç’ekî bi mîtolojiya k’urdan an a ermenîyan r’a nas be, dê bi bawer bibêje, di zargotina herdu gelan da jî têgeheke wisa nîne. Ji bilî wê, p’eyva **վիշապազուն/vişapazun** ne anegorî heşmendîya sazîya bêjeî-wat’eyî ye, ne ji ya p’evsazîya zimanê ermenî ye. Û bi t’evahîya xwe da ev dijî hemû qanûnên pêşveçûna vî zimanî ne.

Ji bo ku bê zanîn, k’a ev nak’okî ji k’u tê, em li goveka (aqar) bik’aranîna paşdaçeka (*u*)**զուն/(a)zun** di zimanê ermenî da binihêr’in.

Di sêrî da divê bê gotin, ku ew p’eyvên têkel ên navborî ji zimanê ermenî yî îroyîn r’a ji ermenîya kevnar miras mane, û goveka bik’aranîna wana bi sînor e. Di ermenîya îroyîn da ew êdî kevnemayî (arxaîzm) in û t’enê di nivîsarên (têk’st) dîrokî da tèn bik’aranîn...

Ji bilî minakên navborî, ev paşdaçeka êdî di cîyekî dinê da nayê bik’aranîn û di ermenîya îroyîn da êdî pêdivî bi wê nîne. Heya, eger mirovek bicêr’ibîne, bi alîk’arîya wê paşdaçekê p’eyveke dinê jî saz bike, ya ku, em bibêjin, bê wat’eya: *ji nivşa milkedaran, serbazan, avakaran*, û heya ji nivşeke wisa qenc û hêja, wek, *ji nivşên bijîşkan, mamostayan, awazhuneran* û yên dinê, dê ji wan r’a li hev neyê: ewê dijî heşmendîya p’eydabûna wê paşdaçekê bi xwe be, di zimanê ermenî da. Ew p’eyvên nû, yên ku bi alîk’arîya paşdaçeka navborî hatibin sêwirandin (em bibêjin!), dê ne xwezayî bin, ewê bi sunî çêkirî bin, dê ne zindî bin, bîyanî bin, û zimanê wan r’ed bike. Bi alîk’arîya wê paşdaçekê t’enê ew p’eyvên têk’el saz bûne, yên ku “esilzade”, “xwedayî”, “şahzade”, “mîrza”, “ji malmezinan” didn zanîn û ne tiştêkî dinê!..

Û, lewra jî, p’eyva *վիշապազուն/vişapazun*, bi wat’eya: *ji nivşên zîyê, ji t’ûr’a zîyan* li wê çarç’evê nayê. Analîza bêjezanî, êtîmolojî-peyvsazî yên vê p’eyvê (her weha, di nav goveka mîfolojîyê da jî), dane xuyan, ku şewazê wê yê despêkî *վիշապազուն/ vişapazun* bûye, bi wat’eya: *peyhatiyên Viştaspa, ji nivşa Viştaspa*, bi mabesta – med-k’urdan, wek *peyhatiyên Viştaspayê p’adşahê bêhempa û comerd*. Lewra jî min li jorê p’eyva *վիշապազուն/vişapazun* di navnişa wan p’eyvên navborî yên ermenî da danenî, lê ew cuda nivîsî, û ew bi stêrkê (*) cuda kir, lewra ku şewazê wê yê despêkî

վիշապազուն/vişapazun – *peyhatiyê Viştaspa, ji nivşa Viştaspa*, bûye.

Li vîra jî ez hêvîdarîya xwe dîyar dikim, ku demekê bê, û di r’êdaksîonên ferhengên ermenî da li şûna p’eyva ***վիշապազուն/*vişapazun**, dê p’eyva **վիշապազուն/ vişapazun** bê danîn, bi wat’eya: *peyhatiyên Viştaspa, ji nivşa Viştaspa*, ya ku dê anegorî şewaz û wat’eya wê p’eyvê ya despêkî be.

Ji herç’ê ku li jorê hatine zimên, dertê hole, ku:

a) Viştaspa kesayetiyeke dîrokî bûye. Ew p’adşahê nebînayî û bêhempa yê Medyayê bûye, û bi comardîya xwe hatye zanîn;

b) Viştaspayê p’adîşahê medan bi nîgara xwe ya p’adîşahê îdealî, têk’oşer’ê ji bo bawerîya r’astî û dadwerîyê va ji hêla gelên cînar va jî hatibûye hezkirin, û hemûyan ji wî r’a r’êz girtine. Û ermenîyan, dema yên med viştaspazûn navkîrine, helwesta xwe ya r’êzgirtinê li hember wî pad’îşahê nebînayî û gelê wî dane xuyan.

...Lê di cîhanê da t’u tişt bêdawî namîne: dem derbaz dibin, merc û r’ewş tèn guhar’tin, anegorî wan, wisa jî gelek tişt hem di nîrxên hemmîrovahî da, hem jî di p’ewendiyên mirovî yên sade da tèn guhar’tin...

7. Di dîrokê da hîç tiştêk jî bê şop wînda nabe.

Û ew jî r’astîyeke dêrokê ye!

...Êdî ew dem bihurîne, demên nû hatine, merc û r’ewşên nû û mirovên nû derk’etîne holê, lê li ser bîngeha wan mîfên (efsane) bêkêr û bêwat’e, yên di derbarê tiştên bûyî-nebûyî da (*wek ku bi r’astî Movsês Xorênatsî ew navkîrine!*), di t’evahîya dîrokê da di derbarê net’ewekê da dîtînen wisa yên lêpovajî û t’ewş belavkîrine...


Û hê dereng, heya piştî hezar salî jî, wek ku li jorê hate gotin, Movsês Xorênat'sî dengveger'ên wan mîfan, wek r'astî bi bîr tîne û hewl dide wana bi p'eyvekê şirove bike, ya ku t'u pêwendîya xwe bi wê wat'eyê r'a nîne: "...Evan tiştana, wisa jî di destaneyên strankî da tîn gotin. Ev jî, wek ku mîn bihistye, di nav nişteciyên herêma Goxtin a bi şeravê dewlemend da bi dilgermî hatine parastin. Di nav wan da stran hene, yên ku di derbarê Artasêş û lawên wî da dibêjin û wisa jî di derbarê peyhatiyên Ajdahak da (Astîag/Îştûvêgû. – E. C.) bi bîr tînin û ji wan r'a bi awayekî lomeyî dibêjin yên ji t'ûr'a zîyê (di orîjînalê ermenî da – Վիշապապառնու/վճապազոն – E.C.), ji ber ku p'eyva Ajdahak di zimanê me da tê wat'eya zîya". – Xorênat'sî gotina xwe bi dawî tîne. [30, r'û. 84].

Li ber ç'avan e, di vê nivîsarê da hinek tişt t'evlihev kirine. Di wî p'arç'eyê ji p'irtûka Xorênat'sî ya navborî da mabest ne ku p'eyva *ajdahak/udḡuhwily/azdahak* e, lê p'eyva *ajdaha/udḡuhwu/azdaha* ye, her çiqas, ji van herdu p'eyvan hîç yek jî di zimanê ermenî da wat'eya zîya (Վիշապ) nade zanîn [r'avekirina van p'eyvan a giştî – 13]... Wek ku tê xuyan, an ev şaşîyeke teknîkî ya nivîsyarên paşê bûye, yan jî, hinekên ji wana zêde bi wan mîfên bêkêr û bêwate yên farsan r'a giro bûne...

Li vira, helbet, wisa jî heya r'adeyekê wê r'ewşê r'ola xwe listye, ya ku piştî ji ser t'ext avîtina Îştûvêgûyê p'adişahê Medyayê yê dawîn û, di encamê da, r'ûxandina Împêratorîya Medyayê li hole bûye. Û piştî van bûyerên dramatîk êdî bûye mode, li ber Qurûşê vasalê duh ê xayîn û delk'baz û peyhatiyên wî xwe xweş bikin. Û ji wê û pêva bi hevguhâr'tina danayan û lêpovajîkirina agahiyên dîrok ji hemû serdarên farsan r'a bûne kevneşopîyekê...

Bi kurtebînî di derbarê wê da, k'a çawa Qurûş dibe p'adişah.

Wek ku tê gotin, Qurûşê (Qurûşê II ê dihatûyê) satrapê bindest ê fars derdorê sala 550î ya berî serdema me, bi alîk'arîya çalak a giregir û maldarên medî, yên ku ji Îştûvêgûyê (Astîag) p'adişahê Medyayê dilxweş nînbûn, bi r'êya delk'ûdolaba leşkerî di Medyayê da desthilatdariyê hîltînin destê xwe. Û wek kû tê xuyan, di destpêkê da giregiran ji Qurûş bawer kiribûne, ku ew t'enê Îştûvêgûyê kalkê xwe ji ser t'ext davêje... Û, wek ku tê xuyan, piştî wê, ji bo ku ew li ber giregîrên medî, siyasetmeder û serfermandaran xapînok neyê xuyan, ew di destpêkê da t'enê navê Împêratorîya Medyayê bi Împêratorîya Med û farsan diguhêr'e... Û, wek ku ji bûyeran tê xuyan, giregîrên medî yên serhildêr di destpêkê da li hatîna Qurûş a li ser t'ext wek derbeya qesrê ya hindur'in nihêr'îne. Lêbelê hêvîyên wana nehatine sêrî, her çiqas, piştî wê xiyaneta wan împêratorî bi xwe wek a Med û farsan hatye navkirin. [5, p'irtûka I, beşê. 107 û 125 – 130; 8, r'û. 413 – 424; 18, r'û. 52 – 58; wisa jî li xerîta 2em binihêr'in – di pêvekê da ye], lê piştî çend nivşan yên medî bi berekê va ji hemû p'eywirên girîng tîn dîrxistin û t'enê dikaribûne erk'ên r'adeya duyem di wê împêratorîya cîhanî da pêk binin, ya ku di dîrokê da wek dewleta hexamanîyan tê nasîn, lê Medîya bi xwe jî dibe yek ji satrapîyên (herêm) wê. ...



8. Her çi jî hebe!

Ji bo ku mirov tê bigihîje, k'a, gelo ev mîf û ç'îrok destpêka xwe ji ku digirin, em careke dinê vege'rin ser agahîyên dîrokî yên di derbarê *Kavî Viştaspê* nebînayî û comerd da.

Wek ku li jorê jî hatibû gotin, di ç'avkanîyên dîrokî da navê *Viştaspa* wek p'adşaheki qenc (îdéalî), têk'oşer'ê ji bo bawerîya r'astîn û dadwerîyê tê bîranîn, bi t'aybet di derbarê lehengîya wî ya serbaziyê da tê gotin (van agahîyan anegorî agahîyên Movsês Xorênat'sî bikin, ên ku wî "...di p'irtûka keldaniyan da dîtibûye", û li jorê behsa wan hatibû kirin)... Lê, tiştê balk'êş ew e, ku dîsa jî, di dîroknûsiya ermenîyan da *med-k'urdan* hê jî *vîşapazûn* (*վիշապազուն/ vshapazun*), û ne *vîştaspazûn* (*վիշտասպազուն/ vshaspazun*) nav dikin.

Çima?

Li jorê hate gotin, çawa di Medyayê da Qurûşê satrapê fars (ê ku paşê dibe Qurûşê II) ê t'orinê îştûvêgûyê p'adişahê dawîn ê Medîyayê tê ser t'ext... Wek ku tê xuyan, ku berî ji ser t'ext avitina kalkê xwe, Qurûş kampanyeye çalak a r'eşkirinê li dijî p'adişê hem di nava giregirana, hem jî di nava gel da meşandye, ji bo ku di nava wan da t'avîyên (mewzî) wî lewaz bike, wana li dijî wî helwestdar bike. Ew bi r'êya mirovên xwe di nav gel da gotegotên vala û bêkêr ên di derbarê tiştên bûyî-nebûyê da di derbarê kalkê xwe da dide belavkirin. Û, wek ku tê xuyan, ew ç'îr'okana wek r'astîyekê hatine p'ejirandin, ji ber ku ew ji hêla nevîyê p'adişê bi xwe va hatibûne belavkirin, ji hêla wî mirovî va, yê ku, hem di qesrê da, hem jî di malbata p'adişê da wek ku dibêjin, "mirovê malê" bûye...

Hema evê dijpropagandayê jî di pîrsa ji ser t'ext avitina îştûvêgû da, wek ku tê xuyan, r'ola xwe ya dîyar lîstye...

Û piştî ji ser t'ext avitina p'adişê jî ev şer' û buxdanbêjî didomin û di nava gelê cînar da jî belav dibin, bi t'aybet jî di nava ên vasal (bindest) da. Lewra ku, wek ku tê zanin, *afrandinên gelêrî yên zarkî carna welatê xwe nînin*.

Va, dîroknûsiya fermî ya farsan li ser bingeha mîfên weha jî dest bi gavên xwe yên yekem dike.

Û, wek ku tê xuyan, paşê mîfên weha wisa ji ji bo hinek beşên berhemên dîroknûsên kevnar, di nav wan da wisa ji ji bo “Dîroka” Hêrodotos, dibin bingeh, . [5, p’irtûka I, beşê 107, 125 – 130].

A, hema, k’îlîta r’avekirina mîfa farsan a di derbarê Îştûvêgûyê P’ir’hespî yê p’adişahê Medyayê da [30, r’û. 89 – 92], û ya r’onîkirina serpêhatîyên di derbarê p’ewendiyên Kavî Viştaspîyê nebînayî û Zerdeşt P’êxember da hema di vir da ye.

Çîrokbêj-“dîroknûsên” qesrî yên farsan bi vî awayî di hindûr’ê qesrê da li dû hev danayên dîrokî bi hev biguhêr’in, bûyeran lêpovajî bikin, navê kesayetiyên dîrokî wisa diguhêr’in û her tiştî wisa dikin, qey bibêjî ewana hiç t’unebûne jî...

Lewra jî, tiştê matmayînê nine, ku di hewayeke wisa da divê şewazdayêneke wisa ya dîrî heş û sewdayê mirov a dîroka “windabûyî” ya Kavî Viştaspîyê p’adişahê nebînayî û welatê wî derk’eta holê: “...ne di derbarê wî welatî da, yê ku wî p’adşahtî lê kirye, ne jî di derbarê dema jîyana wî ya r’êal da hiç daneyeke r’astîn nîne, her çi qas hiç şik û gumanek nîne, ku padişahê wî wisa bi r’êalî hebûye”...

Û, hema ji wê jî, mirov dikare bi dibetîyêke (ihtîmal) mezin bibêje, ku sedema wê, ku dîroknas bi t’u awayê “nikarin” ne welat, û ne jî dema p’adişahiya Kavî Viştaspa, û ya p’êxembertiya Zerdeşt bi awayekî bibînin, hema di vira da ye...

Lêbelê eva her t’enê t’erefekî pîrsê ye!

9. Û aspêkteke wê dîroka tevlihev a dinê jî...

Lêger’in didin xuyan, ji bilî van hemûyan, wisa ji t’erefekî dinê yê t’evlihevîtiya wê dîrokê ya dinê jî heye. Ew pîrsa r’adeya r’ast bi kod (veşartî) nivîsandin û paşê jî deşîfrekirina nivîsarên “Avêstayê” ye.

... Eger hildin ber hesêv, ku dema hilweşandina “dewleta hexamanîyan” ji hêla Îskenderê Makêdonî va (s. 331ê ya berî s. m.) “Avêsta” hatye t’unekirin: *hemû* p’irtûk *avitine deryayê, an dane ber devê egir, û, eger heya hinek beşên nivîskî yên wê hatibin p’arastin, lêbelê, dîsa ji wê û pêva ew bi zarkî hatibe belavkirin jî, diyar dibe, k’a nivîsara “Avêstayê” çiqasî hatye guhar’tin. Ji ber wê, hiç lêger’inêrekî jî orîjîna wê nedîte, her paşê li ser bingeha kevnepîyî zarkî ya dewr û zemanan “Avêsta” jinûva nivîsîne (bi awayê nivîsa veşartî, ya kodkirî) ...*

Bi dîtina Î. M. Dyakonovê r’ojhilatanzê sovêti-r’ûsî pîrsa dema nivîsîna kevtirîn beşên “Avêstayê” ne diyar e... Ew dibêje, ku yên Gat demekê ji hêla mogan (r’ahîban) û t’erefadarên wê bîrûbawerîyê va bi zarkî hatien belavkirin, lê her piştî Dariûsê I ew û kevnartirîn beşên “Avêstayê” bi hev r’a hatine nivîsîn, dema nivîsa îranî ya li ser bingeha alfabêya aramî hatye bik’aranîn. [8, r’û. 45 – 46].

Lê akadêmîsîan Î. M. Stêblîn-Kamênskî dinivîse, ku “Avêsta” jî, mîna “Êncilê”, ji nivîsarên demên cuda hatye berevkirin, yên ku carana bi zimanê mirî, bi şaşîyên r’êzimanî hatibûne nivîsîn, û p’arç’eyên dinê kime navê (*interpolation*)... Ku ew wat’e, yên ku nivîsyaran kirine nivîsara Gatan, carna dikarin ewana ji ber xwe derxistîbin (hinartîbin)... [4, r’û. 27 – 30].

Û dema nediyarîyêke weha li hole ye, dijar mirov bikaribe bibêje, ku di “Avêstayê da” dikaribûn hemû şewazên zimanî û agahiyên destpêkî hatine p’arastin...

Wisa jî, dibe ku, mirov dijar bikaribe bibêje, ku deşîfrkirina nivîsarên “Avêstayê”, wisa jî ya peykerên kevnar ên nivîskî yên dinê r’ast pêk anîbin...

Û, eger ew hemû, çi ku îro berev bûye, mirov di nava goveka r’astîyên dîrokî da wana li wana binihêr’e, û ne di goveka tiştên bi sunî hinartî yên ç’irokî da, wê demê dê hemû cudahiya di navber dîroka r’astîn û ya hinartî da dê derê ber ç’avan...

Û, lewra jî, anegorî merc û r’ewşên nû, yên ku bi diyarbûna delîlên nivîskî yên nû r’a derk’etine holê, pîrsa dane û bûyerên dîrokî yên lêpovajîkirî îro dibin xwedî girmîgîyêke t’aybet... Lê, eger serpêhatîya di derbarê Îştûvêgûyê P’ir’hespî (erm. Բյուզանդական/Byuraspi Azdahak) yê p’adişahê Medyayê da, ya ku di dema xwe da (dewra V a berî s.m.) Movsês Xorênat’sî di p’irtûkeka keldanî da dîtîbûye û di p’irtûka xwe ya

“Dîroka Ermenîstanê” da nivîsîbû, bi mîfa navborî ya di derbarê heman Îştûvêgûyî da di nav kontêkstekê da binirxînin, derfetên nû p’eyda dibin, ji bo ku mirov bikaribe gelek r’ûpelên t’evlihev ên dîroka kevnar a cîhanê r’onî bike, di nav wê da wisa jî, serpêhatîya Kavî Viştaspayê p’adişahê nebînayî, yê ku di derbarê wî da di Gatan da agahî hene. Lêbelê, yek e, di cîhana zanistî da hatye pejirandin, xwedêgiravî, “...ne di derbarê wî welatî da, yê ku wî p’adşahtî lê kirye, ne jî di derbarê dema jîyana wî ya r’éal da hîç daneyeke r’astîn nîne, her çiqas hîç şik û gumanek nîne, ku padişahêkî wisa bi r’éalî hebûye”...

Û bi evê formulat’sionê jî ezê lêger’inên xwe didomînim.

Ji ber ku jîyana Kavî Viştaspa û ya Zerdest P’êxember bi hev va girêdayî ne, û “*hîç şik û gumanek jî nîne, ku p’adişahêkî wisa (Viştaspa) bi r’éalî hebûye*”, em binihêr’in, k’a da di zanista dîrokî da di derbarê wî p’adişahê nebînayî û bêhemp’a da çi dîyar e, bi t’aybet jî, bi giştî, di derbarê dem û welatê p’adişahîya wî da.

Weha, di derbarê wê serdemê da zanyarê navdar ê amêrikî R’îçard Fr’ay çî dinivîse: “*Li ber destê me dane nînin, ên ku bikaribûna dema r’astîn ya jîyana Zerdest dîyar bikirana; mirov her dikare bibêje, wek ku tê xuyanê, ew di serdema berî damezirandina dewleta hexamenîyan da jîyaye...*” [19, r’û. 50].

Û ji vir jî nêr’îneke heşmendî dertê holê: *eger P’êxember berî damezirandina Împêratorîya hexamenîyan jîyaye û erk’a xwe ya p’êxembertîyê pêk anye, wisan e, ew wê demê bûye, dema hê Împêratorîya Medyayê hebûye...* Û li vira heya hîç pêwîst jî nake, ku mirov zêde lê biger’e, jixwe derdorê sed û bîst salî berê di cîhana zanistê da dizanibûne, ku birûbawerîya Zerdest ola bineciyên Îrana kevnar bûye, di sêrî da ya medan û baktrîyan (*Bactrians*), paşê ya farsên dema Hexamenîyan û Sasnîyan. [27, berga 22^A, r’û. 881 - 884].

Û R’îçard Fr’ay, ji bo dîyarkirina t’emenê P’êxember û dema ku ewî p’adişah Viştaspa ane ser ola zerdestîyê, hejmartinên balk’êş pêk tine û li ser wê bingehê van encaman derdixe hole: “...*Divê mirov ji bîr neke, – ew dinivîse, – ku sala 588ê berî serdema me, ya ku dikaribû anegorî wê demê bûya, gava Viştaspa birûbawerîya Zerdest p’ejirandye (wek ku gihîştîye me, ew wê demê 42 salî bûye)... Anegorî heman kevneşopîyê, – ew didomîne, – P’êxember di 77salîya xwe da mirye, wisa, eger mirov ji xwe r’a bike armanc û li ser bingeha pêşbînîyên nêzîkî heş û aqîlan û kevneşopîyên zerdestîya hê derng li danayên dîrokî yên di derbarê Zerdest da biger’e, wê demê ew salên 628 – 551ê berî s.m. ne...*” [19, r’û. 52 – 53].

Û peyr’a jî, li ser bingeha lêger’inên agahîyên dîrokî, yên di derbrê r’ehên medîyayî yên çanda hexamenî (û ne t’enê ya wê), R’îçard Fr’ay ver’esandina pîrsa navborî nêzîktir dike: “...*di nivîsên kevnar ên farsî yên li ser zinaran da – ew dinivîse, – têrmînên ji hêla wat’eya xwe va girîng hene, yên ku, wek ku tê xuyan, şwazên wana yên medî ne, ne ku yên farsî, û ev jî dide xuyan, ku Hexamenîyan ew ji bakûr deyn wergirtine (ango, ji Medyayê. – E. C.). – Û ji wê pêva, ji bo ku nêr’îna xwe piştrast bike, ew gotinên Strabon tine: “Yên med, lêbelê, wek ku tê gotin, pêşîyên kevneşopîyên ermenîyan û berî wana pêşîyên kevneşopîyên farsan bûne, pêşîyên qiral û peyhatîyên desthilatdarîya wan a di Asîyayê da ne. Mînak, peyva “sto’la”, ya ku xwedêgiravî ya farizan e, hezkirina wan a berbi agirkirina tîr û kevanan û cirîdê, xizmeta p’adişahan cil û wergirtina p’adişahan û r’êzgirtina asta xwedayî li hember p’adişahan ji hêla gelê sade va ji medan derbazî nava farsan bûye”* [19, r’û. 135].

Ango, her çiqas, gelek daneyên dîrokî, bi “saya” hewlên ç’îrokbêjên farss ên qesrê, hatine lêpovajîkirin an windakirin, dîsa jî, bi alîk’arîya analîza êtîmolojî û lêger’inên dîrokî-hemberhevkirinî mirov dikare, t’êrmîn û navên “windabûyî” ji nûva vejînine, û, bi wana r’a, wisa jî, pêvejoya dîrokî ya xwezayî.

Di vê derbarê da dîtîneke bi fesal (endaze) li bal Î. M. Dyakonov heye. Ew bi bawerîyeke t’am nabêje, ku zerdestî di Medyayê da pêşk’etye, heya, eger ew hinek pêşdîtina tîne zimên jî, ew p’ir’ bi mercî ne: “...*Di nav r’êza ç’avkanîyên di derbarê dîroka Medyayê da “Avêsta” – p’irtûka pîroz a ola dogmatîk, cîyekî xwe yê t’aybet heye... T’u*

guman nîne, ku p'ir'anîya wan bawerîyan û dirozgeyên ayînî zerdeştîyê jinûva ji ber xwe dernexistine, ewê ew ji nava bawerîyên gelêrî yê berî xwe hildane, yê ku wê demê kêmezêde êdî amade bûne. Lewra jî ji bo dîroka berekên Medyayê yê îranîxêw û heya r'adeyekê, ji bo berekên dinê jî "Avêsta" ç'avkanîyeke girîng e". [8, r'û. 45 – 55]. – Û li çiyekî dinê jî, her çiqas, qey bibêjî, di dîtînen wî da r'astedêr nayê gotin, ku ew hemû yê Medyayê ne, lê r'edkirineke wisa jî nîne... Bi nêr'îna wî, eger ew mercên ku di derbarê wan da di beşên kevnartîrîn ên "Avêstayê" da tînen vegotin, heya, eger ne medî bin jî, lê dîsa gelekî nêzîkî wana ne...[8, r'û. 416].

Li ber ç'avan e, ku di gotînen wî da nêr'înen veşartî hene, û mirov divê wana r'ast tê bigihîje.

Ji wan nirxandinên li jorê dertê, ku:

– zerdeştî berî pêkhatina delk'ûdolabên qesrê yê Qurûşê satrapê fars û desthilatdarîya nûnerên hexamenîyan di Medyayê da sêwirîye;

– zerdeştî ji sala 588an a berî s.d. me va, dema Kavî Viştaspa zerdeştî p'ejirandye, di Medyayî da pêşbik'etye û belav bibe,;

– piştovanê P'êxwember yê p'adişahî, serok Kavî Viştaspa li Zerdeşt û ola wî xwedî derk'etye, û di wê derbarê da jî di Gatan da agahî hene;

– piştî p'eydabûna r'astîyên dîrokî yê nû êdî mirov dikare, bi r'êya analîzên p'ir'alî yê agahî û daneyên dîrokî, wan tiştan r'onî bikin, yê ku berê her bi hizirî (texmînî) li ser wana axivîne...

10. ...Berbi sur'ên jîyana Kavî Viştaspa va.

Em gav bi gav nêzîkî ver'esandina sur'ên jîyana p'adişahê nebinayî û bêhemp'a, piştovanê Zerdeşt P'êxember – Kavî Viştaspa dibin. Û naha li pêşîya me, li ser r'êya lêger'inînen me pîrsek sekinye: "Çima di demnûsiya (k'ronolojîya) dîrokî ya kevnepî da navê Kavî Viştaspa bi bîr nayin?"

Dema êdî dabêkirina demî ya serdema mijara lêger'inînen me heye, mirov dikare bi r'êya analîza hemberhevkirinê ya r'astîn û agahîyên dîrokî pêşva her'e û dîyar bike, k'a bi r'stî mabesta wana k'îjan p'adişah e?

Naha êdî dîyar e, ku Zerdeşt berî sala 550î a berî s.m. di Medyayê da jiyaye û erk'a xwe ya p'eymdarîya bawerîya r'ast pêk ane... Bi hejmartînen R'îçard Fr'ay, P'êxember di sala 588an a berî s.m. Kavî Viştaspa anye ser bawerîya xwe. Lê anegorî demnûsiya dîrokî ya kevnepî, di wê demê da Ûvaxşatra/Kiaksar (salên 625 – 585an ên berî s.m.) p'adşahtîya medyayê kirye.

Çi dertê hole?

Ji hêlekê va, anegorî hejmartînen R'îçard Fr'ay, dema Kavî Viştaspa zerdeştî p'ejirandye, sala 588an a berî s.m. ye, lê encamên analîzên hemberhevkirinî yê agahîyên dîrokî didin xuyan, ku Zerdeşt P'êxember jiyaye û erk'a xwe ya pêxemberîyê di Medyayê da pêk ane. Wisa jî dîyar e, ku Kavî Viştaspa piştovanê P'êxember bûye, û di Gatan da Zerdeşt wî wek "*piştovanê p'adişahî û serok*" nav dike. Di destnivîsên kevnar ên ermenîyan da hem jî medan, hem jî peyhatîyên wan – k'urdan r'a dibêjin *peyhatîyên Viştaspa*. Ango, her tişt di derbarê wê da dibêje, ku piştovanê p'adişahî yê Zerdeşt Pêxember û serokê Medyayê Kavî Viştaspa bûye...

Ev hemû heşmendî ye. Lê mirov çî bi pîrsa van herdû navan bike: Viştaspa û Ûvaxşatra/ Xvaşatra/Kiak'sar?

Li ber ç'avan e, ku ev hemû dane, jî bilî navan, li hev digirin?

Ev cudahî ji k'u tê? – Ma wisa dibe, ku du mirovên cuda di heman demê da p'adşahtîya heman welatî kiribin?

Mîstîka!

Mirov li k'u biger'e û li k'u ç'ara vê t'evlihevîyê bibîne?

Bi r'astî min li jorê hemû bersîvên ku dikarin ji bo wan pîrsan hebin, nirxandin. Ji bo wê min bi bîngêhîn bala xwe ne ku da mîf û ç'îr'okên kevnar û yê sedsalên navîn, lê da

ser pêşdîtinên heşmendî, yê ku hinek lêger'neran dîyar krîrbûn. Min jî ew dîtinên hîpotêtîk li ser bîngeha r'astîyên dîrokî nîrxandin û nêr'îna xwe anî zimên... Lê paşê ez r'astî vê girêhişkê hatim, ya ku li ser r'êya lêgr'înen min dibe kelem.

Û, dîsa jî, lêgr'înen min di r'amanên min da didomyan.

Lê, eger dîsa cîyek maye, ku mirov divê di wî da jî lê biger'e? Ma ne, eger min nikaribûye bersîva r'astîyên bibînim, ew nayê wê wat'eyê, ku ew hîç nine!

Lê, eger r'astîyên dîrokî bi hewlên lêpok'arên qesrê yê farsan bi hev guhar'tine û t'evlihev kirine? Ma ne, îro bi saya wê mîfa farsan, a ku di dema xwe da (dewra V a s.m.) Movsês Xorênat'sî di "Dîroka Ermenîstanê" da nivîsye, êdî derfetên cîhana zanistî hene, bi mîna keke lêpovajîkirina dêrokê r'a nas bibe. Û jî min r'a jî derfetek p'eyda bû, ku ez bêhtir bi r'êalî li bûyerên dîrokî binihêr'im...

Û jî bilî van, hemûyan, ma ne, wisa jî nivîsarên (têk'st) dinê hene! Lê, eger mirov bersîvên wan pîrsan di wan da jî biger'e? Lê, ger pîrsgîrêk di wê da ye, k'a gelo, ew nivîsarana anegorî xwestina r'astîya wan hatine deşifrekirin?

Û ev pîrs jî bê bîngeh nine.

Eger mirov li r'êza van hemû têrmînan binihêr'e, yê ku jî hêla me va tîn zanîn, dertê holê, ku li vir ne hemû di cîyê xwe da ye. Bnihêr'in, heman Vîştaspa di nivîsarên cuda da bi navne cuda tê bîranîn: *Goştasp*, *Gûştasp*, di ç'avkanîyê yewnanîyan da – *Gîstasp*. Ji bilî vana wisa jî şêwazên p'eyvan ên dinê hene, yê bi heman p'arîne saz bûne: *Byûraspî* (li bal Xorênat'sî), *R'ûhrasp* (li bal Fîrdûsî) û *P'ûrûşaspa* (navê bavê Zerdeşt). Dema mirov van şêwazan hemberî hev dike, dertê hole, ku di dawîya wan t'evan da p'arîna –asp heye. Ango, ew hemû p'eyvên t'ek'el ên cuda ne, yê ku bi heman p'arîna (morfem) –asp, anga, 'hesp', hatine sêwirandin.

Di ç'avkanîyên ermenî da p'eyva *Byûraspî* wek *ya/yê* xwedîyê hezar hespî (*byûr*, erm. – hezar/deh hezar+asp, îranî – *hesp*). Eger mirov p'eyva *byûraspî* hemberî navê *P'ûrûşaspa* yê bavê Zerdeşt bike (p'eyva *բյւր/բյւր* – bi ermenî bilêvkirina p'eyva k'urdî-îranî ya *p'ur'/p'ir'* e – gelek), dê dîmenekî balk'êş derê hole: şêwazê p'eyva ermenî ya *բյւրասպի/byuraspi* û navê bavê *P'êxember* – *P'ûrûşaspa* bi şêwazî mîna hev in! Û ev jî delîleke di derbarê medbûna *P'êxember Zerdeşt* da (bila ne bi r'astedêr be jî!).

Û jî vê û pêva, ezê hewl bidim, ku bizanibim, k'a beşên dinê yê wan p'eyvan tîn çî wat'eyê: *vîşt*, *gûşt*, *goşt*, *lûhr*? Ma ne, naha ew jî wat'eyê xwe hene? Eger em hildin, ku şêwazên *goşt* û *gûşt* şêwazên cuda yê heman p'eyva îranî ne – bi wat'eya *goşt*, wê demê p'eyv-p'arînen *vîşt* û *lûhr* çî wat'eyên xwe hene?

Şiroveyeke balk'êş a p'arîna *vîşt* li bal akadêmîsyana Î. M. Stêblîn-Kamênskî heye: "...Navê p'adişahê piştovanê Zerdeşt Vîştaspa bûye (avêst. Vîştaspa <*vi-šita-asp-), a kû dikare bê wat'eya 'yê hespberdayî' ('yê ku hespê wî berdayî ne', an berî çêre dane, an jî hev belav bûne)...". [4, cîp. 20] – Û ev, jî hêla analîza zimanzanî ya p'arîna konkrêt va, balk'êş e, lê pîrs di wê da ye, k'a emê çiqasî bikaribin wê di nav goveka giştî da, di wê pîrsa kotsêptîtal da bikar binin, a ku benda şirovaeya xwe ye.

Li vîra dikarin dî pêşdîtinê hebin: an ev p'arînan şêwazên cudaxwendinê yê heman p'eyvê ne, an jî p'eyvên cuda ne. Her çî jî hebe, tiştêk li ber ç'avan e: di nav van hemû p'eyvên t'ek'el da p'eya –asp heye. Û ew jî dibe bîngeh, ku mirov bibêje:

– an şêwazê ermenî yê *byûraspî* hatye wat'eya hezar syaran, anga mirovê ku hezar (deh hezar) syarên wî hene, an jî şirovaya vê p'eyvê jî weke şiroveya peyva ermenî ya *Ajdahak* mîna keke êtîmolojîya gelêrî ye (li jorê binihêr'in)?

– an hebûna van p'eyvan jî çanda hespxwedîkirinê ya medan tê? Ma ne ên med bi hespxwedîkirina xwe va bi nav û deng bûne?

Weha, di vê derbarê da Î. M. Dyakonov çî dinivîse: "...Di cîhana kevnar da bi t'aybet ew hesp navdar bûn, yê ku di deşta Nîsayê ya Medyayê da dihatin xwedîkirin, û asorîyan li ber xercan va jî medan hema t'enê hesp werdigirtin..." [8, r'û. 152]. Û bi vê jî mirov dikare navê bavê Zerdeşt şirove bike: *P'ûrûşaspa*, anga, mirovê p'ir'hesp, xwedîyê gelek hespan, jî ber ku ew ne padişah an serekfermandar bûye, ku syarên wî hebûna?!

Lê paşê, hê derng, di ç'avkanîyên ermenîyan da medan, paşê, waisa jî k'urdan wek *vîştaspazûn* nav dikin, ango, peyhatîyê Vîştaspa, ji t'ûr'a Vîştaspa. Ev jî delîlek a di wê derbarê da ye, ku Vîştaspa p'adişahê Medyayê yê r'eal bûye. Û di vê da t'û guman nine, lewra ku ermenîya di derbarê k'urdan da jî dûrva nebihîstibûne, ewana ji demên kevnar va (berî zêdetirî 2500 salan) cînarên k'urdan bûne... (bi vê boneyê em careke dinê gotinên Strabon bi bîr bînin: "... Yê med, lêbelê, wek ku dibêjin, pêşîyên kevneşopîyên ermenîyan, hê berî wan yê kevneşopîyên farizan, serdarên wan û peyhatîyên desthilatdariya wan bûne di Asiyayê da...") [23, r'û. 525].). Û, ji bilî vê, ma ne, di dema serdariya vî p'adişahî da bûye, ku medan ax dane p'enaberên ermenî, ku têda cî û star bibin, lê paşê jî dewleta ermenîyan damezirandine!? [13].

Her çî jî hebe, pîrsa hebûna navên cuda hê jî benda şiroveya xwe ya zanistî ye...

11. Lê, eger...?

Erê, dibe, ku yek ji sedemên cudaşewazîyên navan, û "hebûna" ewqas cîyên pêkanîna erk'a p'êxemberîyê ya Zerdeût, dikare bi zanebûn lêpovajîkirina r'astîyên dîrokî be jî (li jorê binuhêr'in!).

Lêbelê, sedema p'eydabûna wan hemûyan, ên ku îro hene, nikare t'enê ji ber wê be, ku sêwirdarên "dîrokê" yên fars ên derdorên qesrê bi zanebûn r'astîyên dîrokî lêpovajî kiribin! Û nabe, ku mirov hebûna ewqas navên cuda yê heman Kavî Vîştaspî û ewqas gelek "welatên" Zerdeşt t'enê bi wê şirove bike! Ew ne tiştekî heşmendî ye!

Helbet, li vira wisa jî daxwez û hewlên dilxwaz û terefdarên cuda yê bîrûbawerîya P'êxember r'ola xwe listine: her yekê/î ji wana xwestiye, ku Zerdeşt ji meskenê wê/î be, dibe ku her yekê/î xwastibe, ku Zerdeştê "xwe" hebe, û ... zor dane fantaziya xwe. Daxwezên vî r'engî di vê dema me da jî dîyar dibin. Mînak, hinek erk'darên ola îslamê yê jî gelên cuda (yên qazax, t'urkmen, azerbaycanî, ûzbêk, t'eter û yê dinê), her yek ji hêla xwe va "*piştrast dikin*", ku ew jî t'ûr'a Muhmmmed p'êxember e. Û bawermendên sade hîç jî xwe napirsîn jî, k'a, gelo çawa dikare bibe, ku ewqas nûnerên gelên cuda ji t'ûr'a Muhemmed pêxemberekî bin?..

Erê, ev hemû di dîrokê da hebûne, lê mînakên weha jî di vê pîrsê da r'ola xwe ya bir'yardar nalîzin.

Helbet, r'ewşeke dinê jî heye, ya ku, dibe ku, r'oleke dîyar di pîrsa cudaxwendina wan p'eyvên navborî da listibe – ew bi kurt û kêmasîbûna bi kod lêkirina nivîsarên kevnar e û, paşê, hê derng deşîfrekirina wan e. Lewra jî ezê li vira ewê r'awêjê (hîpotêz) jî binirxînim.

Ezê ji wan nivîsaran destpê bikim, ên ku zanîyaran ne carekê di derbarê bi gumanbûna deşîfrekirina wan da nêr'inên xwe anîne zimên.

Îro dîyar e, ku heta naha zanîyaran nikaribûye piştr'ast bikin, k'a gelo nivîsarên "Avêstayê" cara yekem k'engê hatine nivîsîn. Û ewana bi bîngêhîn gihîştine wê nêr'inê, ku dibe ew nivîsarana dema Arşakîyan da (derdorê sala 100î ya s.m.) bi alfabêyeke aramî hatibin nivîsîn. Û dibêjin, ku di wê alfabêyê da, ya ku negihîştîye dema me, tîpên ji bo awazên dengdar nînbûne, lê hinek tîpên bédeng dikaribûne ji bo çend awazên cuda bèn bik'aranîn (!?)...

Lêbelê, wisa jî pîrs di wê da ye, k'a, gelo, nivîsarên "Avêstayê" di çî r'ewşê da gihîştine me. Helbet, min êdî li jorê gotye, k'a, dema dagerkirina Împêratorîya Med û farsan ji hêla Îskenderê Makêdonî va çî hatye serê wê p'irtûka pîroz. Lêbelê, ew beşên "Avêstayê", yê ku piştî wê bi awayekî hatine p'arastin jî, di r'ewşeke wisa da bûne, ku mirov dijwar bikaribe bîne ber ç'avan. Mîrça Êliadê dinivîse, ku ji çaran sêyê "Avêstaya" kevnar hatibûye windakirin. Ku ji herç'ê ku hatine p'arastin, her Gat in, ku wek afrandinên Zerdeşt bi xwe tèn hejmartin, û dikare dilê xwendevanê ne pispor berbi xwe bik'işîne. Ku hemû beşên dinê, bi t'aybet jî p'irtûkên bi zimanê p'ehlewî, yê ku di naavber pênc dewran da (ji dewara IV heya ya IX) jî ber girtine, p'ir' zuha, yekawz û betreng in... [16, r'û. 278].

Û pirseke dinê ya ne kêmbalk'êş jî: her çiqas tê zanîn, ku dema êrişê Îskenderê Makêdonî (s. 331ê ya berî s.m.) “Avêsta” hatibûye t'unekirin (ew avîtine deryayê, dane devê êgir), lê, yek e, zanyar hebûna “Avêstayê” bi şewazê nivîskî ya berî serdema p'ehlewîyan r'ed dikin, li şûna berê pîrsê bidin xwe: “Eger “Avêsta” bi wî şewazê nînbûye, leşkerên Îskenderê Makêdonî çi sotine yan avîtine deryayê?” Hem jî, xwe ewana nikaribûye hemû p'irtûkan t'unekirin? ... Û îro jî hema-hema hemû lêger'îner bi bawer dibêjin, ku di sêrî da “Avêsta” bi zarkî hatye belavkirin, û kesekî nepirsye, çawa dikaribû, ku mirov nivîsarên ewqas giran û dijwar di bîra xwe da bip'arsta û di nava bi hezaran mirovan da li ser erd û aqareke ewqas berfireh belav biikira?..

Weha, di vê derbarê da Î. M. Dyakonov çî dinivîse: “Dijwar, yê Gat hema piştî sêwiranda xwe bi nişanên bizmarî hatibin nivîsîn... Wê demê divê mirov bibêje, ku yê Gat di sêrî da bi bizmarî hatine nivîsîn: lê, ya yekem, delîl nînin, ku di wan herêman da berî wê demê nivîsa bizmarî hatye bik'aranîn; û, ya duyem, delîlên di derbarê wê da nînin, ku “Avêsta” kevnar jî nivîsên bizmarî wrguhartibin nivîsa alfabeyî...” [8, r'û. 46]. – Ango, dixwaze bibêje, ew r'astî, ku leşkerên Îskender “Avêsta” sotine, an avîtine deryayê, ne delîla di derbarê hebûna wê da ye (?!)...

Û, k'a gelo, ew beşên “Avêstayê”, yê ku jî ber êrişê Îskenderê Makêdonî filitîne, çî r'êyê derbaz bûne û gihîştine nivîsên pêşer'ojê, bi t'aybet jî, ew, ên ku li ber destê nivîsyarên pehlewî, yan “wergêran” r'a derbas bûne (di navbera pênc dewran da!), mirov t'enê dikare bîne ber ç'avên xwe...

Ev jî bo têgihîştina pîrsê ya giştî!

Lê, jî bo ku mirov bi awayekî tê bigihîje, k'a gelo, di dema xwe da nivîsarên “Avêstayê” çawa bi şewazê kodkirî (veşartî) nivîsîne, û paşê jî, piştî sedê salan, ew çawa deşîfre kirine, em bi hev r'a li nêr'înen pişporan binihêr'in.

Weha, zanîyarê sovêti, pişporê nivîsarên (têk'st) “Avêstayê” S. N. Sokolov, li ser bingeha lêger'înen zanîyarên bîyanî (*H. Reichelt* u *H. W. Bailei*), dibêje, ku: “... nivîsîna bi şewazê kodkirî (veşartî) di dema Sasanîyan da pêk hatye û di dewra IV da çûye sêrî”. [21, r'û. 11].

Û pîrs di wê da ye, k'a ew nivîsar çawa bi şewazê kodkirî nivîsîne, lewra ku di nivîsa avêstî da p'ir'şewazîya awazên bideng hebûye, lêbelê ew di nivîsaran da hert'im dîyar nebûne, jî bilî vê, û awazên bêdeng jî ne bi aayekî hatine bik'araanîn... Wisa jî dibêjin, ku di nivîsarên “Avêstayê” yê heyî da gelek şaşiyên r'êzimanî û tiştên ku hev nagirin, hene. [22, r'û. 4.].

Cêr'ibandina (*ezmûn*) k'arên lêger'îni yê di warê deşîfrekirin û lêger'înen peykerên kevnar ên nivîskî didin xuyan, ku jî hêla pêkanîne va deşîfrekirina nivîsarên p'ehlewî pîrsgirêkên xwe hene, lê carna jî heya pêkanîna wana ne pêkan e. Bi nêr'îna zanîyarê ermenî yê sovêti, yek jî zinzananê xwedî bandor ê sedsala XX, Hraçya Aç'aryan, gelek caran jî pişporan bi xwe r'a li hev nayê, ku wan nivîsaran r'ast deşîfre bikin, lewra ku, alfabeya p'ehlewî t'ekûz nine, tîp mînanî hev in, lê wat'eyên wan cuda ne. Ku di vê alfabeyê da awazên bi deng (dengdar) nayên nivîsîn, lê tîp di nav hevda wisa bi hev va hatine nivîsîn, ku carana dijwar e, ku mirov wat'eya p'eyvê bibîne, an jî bi giştî nikare wê pêk bîne... Ku gelek p'eyv di nivîsarên p'ehlewî da nahatine p'arastin, jî ber ku, dema farsan îslam p'ejirandine, p'irtûkên xwe yê “heram” yê dema agirp'crestîyê t'unekirine. [34, r'û. 663 – 665; 35, r'û. 240 – 297].

Û ev hemû nak'okî bi giranî li ser r'êya r'ast têgihîtin û wergara nivîsarê dibin asteng. Bi dîtina akad. Î. M. Stêblîn-Kamênskî, Wek ku “Încîl”, wisa jî “Avêsta”, jî nivîsarên demên cuda hatye berevkirin, yê ku carna bi zimanê mirî hatine nivîsîn, bi şaşiyên r'êzimanî û pêvekên hê derng va... Cw wat'eyên ku wergêr kirine nava nivîsarên Gatan, carana dikarin jî hêla wan va hatibin hinartin... [4, r'û.27 – 30]

Û li vira pîrs dertê hole, k'a, gelo di r'ewşê weha da – dema ewqas cudaxwendin di nivîsaran da hene, dema di wê alfabeyê da ewqas dijberî hene, mirov çiqasî dikare

bawer bike, ku ew nivîsarana r'ast hatine deşifrekirin? Ez êdi di derbarê bi kod (veşartî) nivîsîna wê da nabêjim.

Wê demê, ihtîmala r'ast deşifrekirina nivîsarên avestayî (wisa jî yên li ser zinaran), çiqas diçe, kêmtir dibe? Û li vira pirs dertê holê: "Lê mirova çawa dikare bi bawer be, ku ew p'eyvana, yên ku hatine deşifrekirin, hiç nebe, bi t'êorêtîkî nêzîkî orjînalaxwe ne? Ev nayê wê wat'eyê, gelo, ku divê hê jî li bingeha wî zimanî biger'in, yê ku zanîyaran jî xwe r'a wisa bi hêsane hildane û "avestayî" nav kirine?"



12. Ver'esandin û encam!

Dîsa jî, ji bo wê ku bersîvne zelal ji bo pirsên cudaxwendina nav û termînên nivîsarên kevnar bên dîtîn, em lêger'inên xwe bidomînin.

Di destpêkê da ez careke dine jî bibêjim, ku pirsgrêka sereke di r'êbaza zanistî ya lêger'inan da ye. Dema lêger'ineran li ser nivîsarên avestayî û yên li ser zinaran nivîsî

lêger'in pêk anîne (û ew hemû jî li ser xaka K'urdistanê hetine dîtin), ewana r'astîyên zimanê k'urdî li ber ç'avan negirtine, û dema deşîfrekirina wana pîrsa hemberhevkirina matêrialên nivîsarên kevnar bi yên zimanê k'urdî r'a hîç jî nehatye ber heşê wana. Û, ji bo ku nivîsarên kevnar r'ast deşîfre bikin, ewana serî li "derfetên" zimanê farizî dane, lewra ku, ew zimana t'imê "li ber destê" wana bûye. Lêbelê, nivîsarên yekem ên avêstayî di Medyayê da hatine sêwirandin, û peyhatîyên medan ên r'astêdêr jî k'urd in, û zimanê k'urdî jî, bi hemû zaravên xwe va, dûmayîya zimanê medî ye. Û, eger dema lêger'in û deşîfrekirina nivîsaran p'eyv û şewazîyên zimanî yên wan bi yên k'urdî r'a di goveka hemberhevkerinî da analîz bikirana, cudaxwendinên p'eyv û têrminan dê kêmtir bûna.

Ma ne, tiştê ku R'êçard Fr'ay gotye, ne bê bingeh bûye: "... di nivîsên li ser zinaran ên farsîya kevnar da têrminên ji hêla wat'eya xwe va girîng hene, û şewazên wana jî bêhtir medî ne, ne ku farsî, û ev jî wê destnîşan dike, ku ew ji hêla Hexamanîyan va ji bakûr hatine wergirtin... (ango, ji medan. -E. C.)" [19, r'û. 135]. – Wek prênşîp, dîtineke weha ya Fr'ay r'ast e, lê divê bê gotin, ku li vira ne ku pîrs a hinek têrminên wergirtî ye, lê ya nivîsarên li ser zinaran bi giştî ye, lewra ku, nivîsar bi xe bi zimanê medî hatine nivîsîn!

Hemû peykerên çanda medî yên nivîskî dikaribûn k'uda winda bibûna? – Ma ne, zimanê r'êvebirina dewletê yê wê împêratorîyê medî bûye: bi wî zimanî bir'yarname, r'êvebername, ferman û fermanname û p'eyam hatine nivîsîn, di nav wan da wisa jî yên li ser ber û zinaran! Bi wî zimanî berhemên wêjeyî hatine afrandin û çand pêşk'eteye! Û ev hemû nirx û hêjayîyana dikaribûn çawa û k'uda bê şop winda bibûna?

Ma, gelo tiştêkî wisa dikaribû bibûna?...

Ma ne, piştî ku Qurûş kalkê xwe ji ser t'ext avît jî, di bingeha împêratorîyê da hîç tiştêk nehatibûye guhar'tin: ne sazîya r'êvebirîyê, ne sazîya dewletê, ne zimanê dewletê (medî), ne art'êşa bi r'êkûpêk a bi hêz, ne ola dewletê (zerdeştî). Û ew hemû jî di nav sazîya Împêratorîya Medyaê da pêk hatibûne û şewaz girtibûne. Û ev hemû jî Qurûş r'a wek mîrasekê mabûne (ma ne, ew neviyê p'adişê bûye!). – Her her'e û p'adişahiye bike!

Û, xwezayî ye, hemû peykerên kevnar, yên ku li van erd û aqaran hatine p'arastin, bi bingehên ên Medyayê ne! Ev împêratorî zêdetirî 120 salî hebûye (û, kê-m-zêde, ewqasî jî – nivserbixwe di nav Împêratorîya Med û farsan da), zimanê wê yê dewletê medî bûye, û hemû peykerên nivîskî bi wî zimanî hatibûne sêwirandin. Ma ne, ne bê bingeh bûye, ku piştî derbeya Qurûş jî evê împêratorîyê hê demeke dirêj nav û deng û serbilindîya pêşîyên xwe winda nekiribûye, her çi ças wek Împêratorîya Med û farsan hatye navkirina. [18, r'û. 54 – 58; 23, r'û. 524; wisa jî xwerfiteya 2. – di pêvekê da ye!].

Û ji bilî van hemûyan, bi xwe R'îçard F'ray jî gotinên Stranon tîne, wek ku wan gotinên xwe yên li jorê t'omear bike: "... Yên med, lêbelê, wek ku dibêjin, pêşîyên kevneşopîyên ermenîyan, hê berî wan yên kevneşopîyên farsan, serdarên wan û peyhatîyên desthilatdariya wana bûne di Asîyayê da..." [19, çep. 135]. – Li vira, wek ku tê xuyan, ewî p'eyva 'kevneşopî' li şûna ya 'çand' bi k'ar anye, bi wat'eya wê p'eyvê ya fireh va...

Û, lewra jî, dema dibêjin, ku peykerên kevnar ên zimanê medî nehatine p'arastin, eger mirov nerm jî bibêje, bêr'êtiyeke zanistî ye. Ji wê jî bêhtir, têrminên "farsîya kevnar" an "zimanê avêstî", yên ku li ber maseya nivîsarê hatine hinartin, bi zanistî lêp in (sexe).

Di wê derbarê da, k'a ev têrminana çawa p'eyda bûne, agahîyên balk'êş li bal S. N. Sokolov hane. Ew dinivîse, ku ...herdu zimanên kevnar ên îranî di peykeran da gihîştine me: farsîya kevnar û avêstî. "...Yek ji wan, – ew dinivîse, – yê ku di nivîsarên li ser zinaran ên bizmarî yên p'adişahên hexamanî yên dewrên VI – IV ên berî s.m. da hatine p'arastin. Ev nivîsarana yên Dariûs, Xşayarşa (K'sêrk'sês) û yên dinê bûne, û bêguman, ew zimanê wanî dê yê p'adişahan bûye, yên ku ji herêma Pars (Pêrsîda, Farsa vê demê) bûne, ev jî destûrê dide, ku mirov navê "farsîya kevnar" li wî bike" [21. r'û. 8.].

Li vira bibêjim, ya yekem, heya eger ew ji herêma Pars jî bûne, gelo ew tê wê wat'eyê, ku wê demê zimanê farsî yê nivîskî hebûye, û wana jî bi wî zimanî nivîsîne; û, ya duyem, ma ne, wek ku li jorê jî hate gotin, piştî bi xayîntî di Medyayê da t'ext û t'ac werger'andine jî, lê dîsa ew dewleta gewre wek Împêratorîya Med û farsan hatye navkirin

[18, r'û. 54– 58, wisa jî: xerîta 2. – di pêvekê da], hemû navnîşanên dewletê yên berê (yên medî) hatine p'arastin, di nav wan da wisa jî zimanê dewletê – medî. Û, di derbarê pirseke dinê ya ne kêr girîng da jî: ma ne nivîsara bizmarî ya li ser zinêr, a ku bi fermana Darîûsê I (d. 521 – 485 ên berî s.m.) li Bisêt'ûnê hatye nivîsin, di navçeya başûr-r'ojhilatê Êkbatana p'aytexta Medyayê da ye (Hemedana froyîn – di R'ojhilatê K'urdistanê da). Û ev nivîsara 30 salî piştî derbeya xayînane ya Qurûşê duyem bi çi zimanî dikaribû pêk bihata? Ew jî wê demê, dema ew dewlet bi xwe Împêratorîya Med û farsan bûye!

... Û, gelo, bi zanistî çiqasî r'ast bûye, dema deşîfrekirina wan nivîsaran matêrialên hemberhevkirinî yên zaravên zimanê k'urdî bi k'ar nanîne? Û, bi giştî, ew çiqasî zanistî ye, ku wî zimanî, yê ku ew nivîsaran pê hatine lêkirin, wek “farsiya kevnar” navkirine? – Li ser wê bingehê, ji ber ku ew nivîsaran di nav sînorên dewleta farsan da hatine dîtin? K'a, gelo ev çiqasî heşmendî ye?

Bi awayekî weha, çawa dilê wan xwestye, hildaane û zimanê p'irtûka pîroz a zerdeştîyê “avêstî” navkirine. Weha, di wê derbarê da, k'a ew yek çawa pêk hatye, S. N. Sokolov çî dinivîse: “... *Avêsta r'êyêke dâr û dirêj derbaz bûye: di destpêkê da bi kevnêşopîya zarkî, lê paşê bi ya nivîskî. Xala jêderî ya wê kevnêşopîyê, ... mirov dijwar bikaribe derxe zanebûnê, û lewra jî, zimanê wê peykerê divê, bi mercî, zimanê Avêstayê, an jî “avêstî” bê navkirin...*”. [21. r'û. 10].

Hema wisa, hidane û nav lê kirine...!

Li ber ç'avan e, ku herdu têrmîn jî mercî ne û bingehê wan a zanistî nine.

Lewra jî, wek ku berê jî li jorî hatibû gotin, ji ber ku “Avêsta” ji hêla Zerdeşt P'êxember va di Medyayê da hatibûye sêwirandin, û p'ir'anîya nivîsaren li ser ber û zinaran di xaka Kurdistanê (Medya) da ne, lewra jî, dê heşmendî bûya, eger dema deşîfrekirina hem nivîsaren avêstî, hem jî yên li ser ber û zinaran nivîsî, bi matêrialên zimanên îranî yên dinê r'a, berê pêşin r'êalîteya zimnaê k'urdî li ber ç'avan bihatana girtin, lewra ku zimanê k'urdî dûmahîya xwezayî ya zimanê medî ye.

Ji bilî vê, dê r'ast bibûya û dê bi zanistî bûya, eger di vê pêvajoyê da bi matêrialên zimanên îranî r'a wisa jî yên zimanê ermenî bihatana bik'aranîn, lewra ku, di vî zimanî da bi hezran p'eyvên îranî hene, yên ku di demên cuda da zimanê ermenî ji zimanên îranî wergirtine, û gelek ji wana ne di p'ehlewî da ne di farsî da nehatine p'arastin. Û p'ir'anîya wan p'eyvana di zimanê ermenî da bi şêwazê xwe yê r'esen hatine p'arastin (Hraçya Aç'aryan navnişa 1405 p'eyvên wisa tîne), ji ber wê jî heya nîveka salên pêncîyî yên dewra bihurî ermenî wek yek ji zimanên k'oma îranî hatye hejmartin. [34. r'û. 663; 35, r'û. 218 – 225].

Û, dîtinek jî bi vê boneyê: dema zanîyan di derbarê p'eyvên îranî yên di zimanê ermenî da axivîne (û îro jî diaxivin), mabesta wan bi bingehîn zimanên p'ehlewî û farsî bûne. Lêbelê, ermenî di dîrokê da pêşîyê di nav goveka bandorîya çanda medî da bûye, û her paşê goveka çanda p'ehlewîyan p'eyda bûye. Ew jî, çanda p'ehlewî bi xwe jî di nav goveka çanda medî ya giştî da sêwiraye. Û, wek ku tê xuyan, eger mirov lêger'inên êtîmolojî pêk bîne, dê derê holê, ku beşê mezin ê bi hezaran van p'eyvan ên ji medî (k'urdî) wergirtî ne, û her beşekî biç'ûk dê yên farsî bin. Li vira, dibe ku di cî da be, ger mirov careke dinê gotinên Starbûn bi bîr bîne, yên ku R'îçard Fr'ay di p'irtûka xwe da anîbûne: “... *Yên med, lêbelê, wek ku dibêjin, pêşîyên kevnêşopîyên ermenîyan, hê berî wan yên kevnêşopîyên farizan, serdarên wan û peyhatîyên desthilatdarîya wana bûne di Asîyayê da...*” [19, ctp. 135].

Eger mirov herç'ê li jorê hate gotin t'omar bike, dê derê hole, ku:

a) her çiqas di zanista dîrokî da dîtîne diyar ên kevnêşopî di derbarê dîroka Medyayê, Împêratorîya Med û farsan û p'ehlewîyan da çê bûne jî, lêbelê lêger'inên agahîyên dîrokî yên serdemên cuda didin xuyan, ku:

– piştî derbaya xayînane, ya ku ji hêla neviyê p'adişahê Medîyayê, satrapê fars Qurûş (Qurûşê II) û malmezînen medî va pêk hatibûye, Împêratorîya Med û farsan derk'eteye ser

sehneya dîrokê, ya ku li ser bingeha Împêratorîya Medyayê û bi kevneşopiyên wê pêşva çûye;

– Împêratorîya Med û farsan, a ku wisa jî, wek Împêratorîya hexamanîyan tê zanîn, û heya êrişa Îskenderê Makêdonî (s. 331ê ya berî s.m.) hebûye, bi sazîya xwe ya dewletê û şewazê r'êvebirîya xwe va dûmahîya Împêratorîya Medyayê bûye;

– Qurûşê II bi xwe, û gelek nûnerên binemala hexamanîyan, wek r'ayedarên dewletê, di nav sazîya Împêratorîya Medyayê da, li ser bingeha çanda medî gihîştine û pêk hatine;

– nîrxandîna agahîyên dîrokî didin xuyan, ku Zerdeşt P'êxember med bûye, ew di nava derdorê nêzîkî qesra p'adişê da gihîştîye, lewra ku ew bi xwe ji binemala mogan (r'ahîban) bûye [4, r'û. 20 – 21], û berî dîyarbûna zerdeştîyê mîrik bi xwe jî di heman demê da mag (r'ahîb) bûne [8, r'û. 416], lewra jî, wek ku tê xuyan, p'êwendiyên wî yên nêzîk bi malbata p'adişê û Kavî Viştaspayê bi xwe r'a hebûne...

– Zerdeşt P'êxember “Avêsta” bi zimanê medî, di medyayê da sêwirandîye, li wira jî erk'a xwe p'êxemberîyê pêk anîye, û li wira jî zerdeştî bûye ola dewletê; di vê derbarê da daneyeke di derbarê kevneşopiyên dîrokî da heye, ya ku dibêje, ku *Medya* di dewr û zemanê kevnar da di *jiyana siyasî, êkonomî û çandî da xwedî cîyekî berbiç' av bûye û li ser xaka wê zerdeştî bi berfirehî belav bûye*. [3, berga 16, r'û. 212]. Û, dibe ku, lewra jî di Gatan da di wê derbarê da agahî nînbûne, k'a gelo welatê Zerdeşt li k'u bûye û navê wî welatî çi bûye, yê ku kavî Viştaspa padişahî lê kirye, *lewra ku, yên ku guhdarîya Gatan kirine, ew baş dizanibûne*...

– anegorî lêger'inên zanistî, Zerdeş erk'a xwe ya p'eyamdarîya ola r'astîyê dema serdarîya p'adişahê Medyayê pêk anîye, yê ku, anegorê demnûsîya kevneşopî(k'ronolojî), navê xwe Ûvaxşatra (Kiak'sar) bûye;

b) bi derketina agahîyên nû yên di derbarê hinek r'astîyên dîrokî da, yên ku heya naha nedihatî zanîn, derfet çê dibin, ku mirov van dîtinan bîne zimem:

– ew, ku di “Avêstayê” da p'adişahê Medyayê û piştovanê Zerdeşt wek Kavî Viştaspa tê bîranîn, û di ç'avkanîyên kevnar ên ermenîyan da hem medan (di nav wan da, wisa jî, p'adişahê wan Îştîvêgû), hem jî k'urdan wek peyhatîyê Viştaspa nav dikin (li jorê binihêr'in!), derfetê dide, mirov bibêje, ku navê wî p'adişahî yê kesî (yê ku malbatê lê kirye, û ew bi wî mezin bûye) Kavî Viştaspa bûye; lê ew di demnûsîya kevneşopî da wek Ûvaxşatra/Xvaşatra (yewn. Kiak'sar) hatye bîranîn, û ev jî ji bo wê serdemê tşteki xwezayî bûye: *wê demê ji bilî navê kesî, wisa ji navên p'adişahan ên desthilatdarîyê hebûne, û ew bi wî navî di çihanê da wek p'adişah hatine naskirin*. Di vê derbarê da li bal Dyakonov agahîyên pêbawer hene. Û, divê bê gotin, ku hema li wira jî ew dinivîse, ku navê zanîn, k'a gelo Hexamenîuên pêşin navên xwe yên kesî yên ji navên desthilatdarîyê cuda hebûne, an na. [8, r'û. 49].

Eger mirov herçê ku hatye gotin, tomar bike, dikare bibêje, ku Viştaspa nave kesî yê padişahê Medyayê bûye, ku ew bi wî navî di jiyana malbatî derdorên nêzîk da navkirine, lê naavê wî yê duyem: Ûvaxşatra/Xvaşatra, naavê wî yê padişahîyê bûye.

Û – hinek dîtin jî di derbarê wê dîroka t'evlihev da:

– ew, ku nave p'adişahê Medyayê, piştovanê Zerdeşt P'êxember hem di “Avêstayê” da, hem jî di nivîsarên p'ehlewî da wek Kavî Viştaspa tê bîranîn, lê di ç'avkanîyên farsîya navîn da, wek Goştasp/Gûştasp derbaz dibe, dibe bingeh, mirov bibêje, ku ew encama hewlên wan nivîsyanê dîrokê yên fars bûye, yên ku di xizmeta qesrê da bûne...

– Di nava k'urdan da Viştaspa wisa jî wek Key Ak'sar tê zanîn (di yewnanî da – Kiak'sar) û ew bi r'eha wî ya Keyanîyan tê şirovekirin; [28, r'û. 231 – 234].

– p'eyva Ûvaxşatra/Xvaşatra, ya ku di dîrokê da wek navê Viştaspa tê bîranîn, wek ku tê xuyanê, p'eyveke medî ye û tê wat'eya *p'adişah*. Ev p'eyv û ya farsîya kevnar a *xšāyaθiya/xšayatiya* – p'adişah û ya hindî ya *kšatra/kšatra* – xarîzma desthilatê bi êtîmolojî digihîjin hev; wisa jî, wan peyvan hemberî p'eyva farsîya kevnar a *Xšayārša/Xšayarša* – navê padişahêki farsan *Xšayaršayê I*– Kiak'sarê I bikin.

Mirov li vira çî diakarîbû çî bigota?

Gelo ji min r'a li hev hat, ku ez bersîva hemû pirsan bidim? – Helbet, na! Eva her t'enê gaveke biç'ûk e – li ser r'êya r'onîkirina dîroka “windabûyî” ya jiyana Zerdeşt P'êember û piştovanê wî yê nebînayî Kavî Viştaspa. Ji vê pêva gotin a pisporan e. Û her bi hev r'a, bi hewlên giştî mirovê bikaribe wan r'ûpelên tarî yên dîrokê r'onî bike, yên ku benda dema xwe ne...

Lê dema pêş me da pirsê têk'ilîyên dîrokî yên zerdeştîyê û gelê k'urd benda me ne, hê divê em bi hev r'a di derbarê şopên vê bîrûbawerîya kevnar ên di nav k'urdên îro da biaxivin.

Di derbarê vê da jî – di beşê vê gotarê yê di r'êzê da!

* Ev gotar bi zimanê r'ûsî bûye û di malp'er'a *KurdPress* da hatye weşandin – <http://kurdpress.ru/?p=22061> ; û wergera wê ya k'urdî min pêk ane. – E. C.

Wêje û ç'avkanî

1. Альберт Олмстед «История персидской империи», Москва, 2012//Albêrt Olmstêd, “Dîroka Împêratorîya farsan”, Moskova, 2012;
2. Бойс М. Зороастрийцы. Верования и обычаи, Москва, 1987/Boys M., “Yên zerdeştî. Bîrûbawerî û t'ore”, Moskova, 1987.
3. Большая советская энциклопедия, БСЭ, Москва, 1969 – 1978/Êntîklopêdiya mezin a sovêti, Moskova, 1969.
4. *Гаты Заратуштры*. Перевод с авестийского, вступительные статьи, комментарии и приложения И. М. Стеблин-Каменского, Санкт-Петербург, 2009// Gatên Zardeşt. Werger a ji zimanê avêstî, gotarên pêşekî, şirove û pêvek ên Î. M. Stêblîn-Kamênskî, Sankt-Pêtêrbûrg, 2009.
5. *Геродот, История//Hêrodotos*, “Dîrok”.
6. Дандамаев М. А., Месопотамия и Иран в VII-IV вв. до н.э. Социальные институты и идеология, СПб, 2009//Dandamayêv M. A., “Mêspotaniya û Îran di dewrên VII – IV ên berî s. d. da”, Sankt-Pêtêrbûrg, 2009.
7. Дорошенко Е. А., Зороастрийцы в Иране, М. 1982//Doroşenko Yê. A., “Zerdeştî di Îranê da”, Moskova, 1982.
8. Дьяконов И. М., История Мидии, М. – Л., 1956 // Dyakonov. Î. M. “Dîroka Medyayê”, Moskova –Lênîngrad, 1956.
9. Желтова Е. В., Античная традиция о персидских магах, Санкт-Петербург, 2011//Jêltova Yê. V., “Kevneşorîya kevnar di derbarê mogên farsan da”, Sankt-Pêtêrbûrg, 2011.
10. Заратуштра – Пророк Единого Бога//“Zerdeşt – P'êxemberê Yek Xwedayî” – <http://www.zoroastrian.ru/node/281>
12. Заратуштра – пророк и праведник/Zerdeşt – p'êxember û hewarî – <http://nervana.name/teachers/zara.htm>
13. Ezîz ê Cewo, “Lê k'a, êdî r'astî li k'u ma?” – <http://www.amidakurd.net/qunciknivis/1%C3%AA%k%a%20%C3%AAd%C3%AE%r%ast%C3%AE%li%k%u%ma>
14. Ezîz ê Cewo, “Çima, divê yên êzdî bibin êzîdî-sofî, û êzdîtî bê t'unekirin û ji holê r'abe?” - [http://www.amidakurd.net/qunciknivis/çima divê yên êzdî bibin êzîdî sofî û êzdîtî bê t'unekirin û ji holê r'abe](http://www.amidakurd.net/qunciknivis/çima%20divê%20yên%20êzdî%20bibin%20êzîdî%20sofî%20û%20êzdîtî%20bê%20t%20unekirin%20û%20ji%20holê%20r%20abe) ; û r'ojnemeya “Pênûsa nû”, hejmar: 39 – 44 – <http://www.penusanu.com>
15. Ezîz ê Cewo, “Ezdazanê ermenî yê destpêka sedsala XX di derbarê êzdîyan û êzdîtîyê da” - [http://www.amidakurd.net/qunciknivis/ezdazanê ermenî yê destpêka sedsala xx di derbarê êzdîyan û êzdîtîyê da](http://www.amidakurd.net/qunciknivis/ezdazanê%20ermenî%20yê%20destpêka%20sedsala%20xx%20di%20derbarê%20êzdîyan%20û%20êzdîtîyê%20da) ; û r'ojnemeya “Pênûsa nû”, hejmar: 51 – 52 – <http://www.penusanu.com>

16. Мирча Элиаде, «История веры и религиозных идей», том I, Москва, 2002// Mîrça Êlîadê, “Dîroka olan û hizra olî”, berga I, Moskova, 2002.
17. Мифы народов мира (Энциклопедия). Главный редактор Токарев С. А., 1980/Mîfên gelên cîhanê (Êntsîklopêdî). Êdîtorê sereke Tokarêv S. A., 1980.
18. Опарин А.А., Всемирная история и пророчества Библии, Харьков, 1997//Ораîн А. А., “Dîroka hemcîhanî û gotinên pêxemberane yê Êncîlê”, Xarkov, 1997.
19. Ричард Фрай, Наследие Ирана, Москва, 1972//R’îçard Fr’ay, “Mîrasa Îranê”, Moskova, 1972.
20. Рыжов К. В., Все монархи мира. Древний Восток. М., 2001//R’îjov K. V., “Hemû qralên cîhanê. R’ojhilata kevnar”, Moskova, 2001.
21. Соколов С. Н., Авестийский язык, Москва, 1961//Sokolov S. N., “Zimanê avêstî”, Moskova, 1961.
22. Соколов С. Н., Язык Авесты, Ленинград, 1984//Sokolov S. N., “Zimanê Avêstayê”, Moskova, 1964.
23. Страбон, География, XI книга, Москва, 1964//Strabon, “Erdnîgarî”, p’irtûka XI, Moskova, 1964.
24. Тиханович Ю.Н., Козленко А.В. 350 великих. Краткое жизнеописание правителей и полководцев древности. Древний Восток; Древняя Греция; Древний Рим. Минск, 2005//Tîxanovîç Yû., N., Kozlênko A. V., “350 kesên gewre. Bi kurtebînî di derbarê jiyana desthilatdar û serekfermandarên cîhana kevnar da. R’ojhilata kevnar; Yewnanistana kevnar; R’oma ya kevnar”, Mînsk, 2005.
25. Успенская А., Зороастризм за 90 минут, СПб, 2006//Ûspênskaya A., “Di derbarê Zerdestiyê da – di navbera 90 deqeyan da”, Sankt-Pêtêrbûrg, 2006.
26. Эндрю Коллинз, Падшие ангели, Москва, 2008//Êndryû K’ollînz, “Firêştêyên ji jorda hatî”, Moskova, 2008 (wergera r’ûsî ya p’irtûka Andrew Collins, “From The Ashes of Angels”).
27. Энциклопедический Словарь Ф.А.Брокгауза и И.А.Ефрона, СПб, 1890 – 1907 //Fehenga êntsîklopêdî ya Brokhaûz û Yêfron, Sankt-Pêtêrbûrg, 1890 – 1907.
28. Ekrem Cemil Paşa, Dîroka Kurdistan bi kurtebirî, Bruksel, 1995.
29. Մախմութով Ն. Խ., «Քուրդ ժողովուրդը», Երեվան, 1959// Maxmûdov N. X., “Gelê k’urd”, Yêrêvan, 1959.
30. Մովսես Խորենացի, Հայոց պատմություն, Երեվան, 1991// Movsês Xorênatsî, “Dîroka Ermenîstanê”, Weşangeha “Hayastan”, 1990; têbînîyên r’ûsî ji weşana wê ya rûsî: Mowsec Xorencî, «История Армении», Издательство «Айастан», 1990.
31. Մինն Վարդապետ Տէր-Մանուէլեան, «Եզդիի կուրման», Ախալցխա, 1910// Sîon Vardapêt Têr-Manvêlyan, “Kurmancên yêzîdî”, Axaltsxa, 1910.
32. Ժամանակակից հայոց լեզվի բացատրական բառարան (ՀԳԱ Լեզվի ինստիտուտ), չորս հատորով, Երևան, 1969 – 1980//Fehenga êtîmolojî ya ermenîya îroyîn (Înstîtûta zimên a Akadêmêya zanîstê ya Ermenîstanê), bi çar bergan, Yêrêvan, 1969 – 1980.
33. Էդուարդ Բագրատի Աղայան, Արդի հայերենի բացատրական բառարան, Երևան, երկու հատորով – 1976//Ê. B., Axayan, “Fehenga êtîmolojî ya bingehên ermenîya îroyîn”, bi 2 bergan, Yêrêvan, 1976.
34. Աճառյան Հր., Հայերեն արմատական բառարան, հատոր Գ, Երեվան – 1979//Aç’ar’yan Hr., Fehenga êtîmolêgî ya binaxeyên zimanê ermenî, berga 4em, Yêrêvan – 1979
35. Աճառյան Հր., Հայոց լեզվի պատմություն, Ա հատոր, Երեվան, 1940 թ.// Aç’ar’yan Hr., “Dîroka zimanê ermenî”, berga I, Yêrêvan, 1940.

Ezîz ê Cewo
Gelawêj-cotmeh, bajarê Pyatîgorsk/R’ûsîya

